


## Mele Remezan û mirovê feqîr

Mirovê feqîr, bavê wî diçe ber dilovaniya xwe. Cara ewîl ji mala wî yek diçe rehmetê. Mirovê feqîr tu caran neçûbû ser miriyan û ser goristanan. Di emrê xwe de neçûbû serxweşî û mizgeftan lê vê carê bavê wî çûbû ber dilovaniya xwe... ***Adil Başaran / R.5***



## Ûsivê Mero

Ûsivê Mero li zozanên Eledaxê di nav şer û pevçûnan de mezin dibe. Di ciwaniya xwe de, 6 leşkerên Osmanî yên ji bo berhevkirina bacê tên êla Bekiran, dikuje û dertê çiyê. Çendek şûn de, nêzî behra Wanê... ***Sedat Ulugana / R.8***



## Ez kor im

Ew roj pir germ bû, ez û hevala xwe çûn ser kaniyê, ew dem kesek li wan der û dorê nîne; em dikaribûn bi dilekî rehet bikevin gola li ber kaniyê. Cemê got, ez ê derkevim ser vê darê, ka binêrim li der û dorê şivan û gavan hene yan na... ***Kewê Redkan / R.10***


# xwebûn

9-15 MIJDAR 2020 HEJMAR: 47 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org




## Heta kurd nebin yek dê li me aş nebe felek

Nivîskar Hemîd Dilbihar pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Divê em tu car ji bîr nekin; heta em kurd nebin yek, dê li me aş nebe felek. Divê tu kurd bi neyarên kurdan re têkilî daneyne û dijberiya kurdên din neke. Bêguman divê êdî birakujî/xwişkkujî, ango xwekujî, xwefiroşî, welatfiroşî û xayintî bikeve ber bayê yekitiya kurdan, yekitiyeke azad û demokratîk. Ku kurd bixwazin şoreşa azadiyê li seranserê Kurdistanê bi ser bixin, Kurdistaneke yekbûyî ya azad û demokratîk saz bikin, di nav neteweyên cîhanê de wek neteweyeke azad û demokratîk bi serfirazî cihê xwe bigirin, divê demildest kongreya xwe ya neteweyî saz bikin." ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

YEKITIYA PARLAMENTERAN

### Li dijî şerê birakujiyê înîsiyatîf ava kirin... ***Nûçe / R.6***

## Qetilkirin li gorî mevzûatê ye!


Zilm û zordariya dewletê ya li hemberî welatiyên sivîl ên kurd berdewam e. Hefteya borî bûyereke mîna bûyera ku di meha îlonê de li navçeya Şaxê ya Wanê qewimîbû li navçeya Geverê ya Colemêrgê pêk hat. Leşkerên ku derketin operasyonê li gundê Avyan ê bajaroka Bajêrganê ya Geverê welatiyê bi navê Şeralî Derelî qetil kirin. Leşkeran piştî ku Derelî qetil kirin, bi saetan nehiştin ku xizm û gundiyên Şeralî nêzî cenazeyê wî bibin. Ji ber vê yekê cenazeyê Derelî bi qasî 6 saetan li ber çavê malbatê li erdê hat hiştin... ***R.3***

# Xewnên dagirkeran pêk neynin

Li başûrê Kurdistanê xetereya birakujiyê ku li Zînî Wertê dest pê kir berdewam e. Piştî ku hikûmeta Başûr pêşmergeyên PDK'ê sewqî Garê kir û di encama teqîna mayînê de pêşmergeyek jiyana xwe ji dest da. Parlamenterê Tevgera Goran ê berê Dr. Şêrko Mihemed Emîn Qadir ji rojnameya me re axivî û helwesta Barzanî rexne kir û got ku divê nebe alîgirê şer. Qadir wiha got: "Hewce ye Barzanî planên dagirkeran û xewnên dewletên dagirker ên li ser Bakur, Başûr û beşên din ên Kurdistanê bibîne û bangawaziya şer neke û aliyê diyalogê bi pêş bixe."... ***R.6***

## Gel dikare pêşî li şer bigire

Li herêma başûrê Kurdistanê geşedanên siyasî û leşkerî êdî hatine radeyeke pir xeternak. Tevî hemû hewildanên partî û aliyên siyasî yên li Başûr û çar perçeyên Kurdistanê PDK di ya xwe de israr dike. Bi taybetî piştî derketina DAIŞ'ê û êrîşên 2014'an, PDK ji xeta neteweyî dûr ket û bi temamî ket bin kontrola dewleta tirk. Niha li herêmê li şûna PDK'ê endamên MÎT'a tirk biryarê digirin û li gor wê jî PDK tevdigere. Ji ber hewildanên PDK'ê her diçe rewş xeternaktir dibe. Çi dibe bila bibe pirsgirêk çiqas mezin be bila bibe, ne gengaz e ku bi riya diyalogê neyê çareserkirin. Berpirsên PKK'ê di her daxuyaniya xwe de îşaret bi diyalogê kirin û gotin: "Em amade ne ku meseleyê bi riya diyalogê çareser bikin."... ***Felemez Ulug / R.7***





## Dest bi çalakiyên bênavber dikin

Berdevka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Ebru Gunay, li navenda giştî ya HDP'ê civîneke çapemeniyê li dar xist û Bernameya Serdema Nû ya Çalakiyan a partiya xwe aşkera kir. Gunay diyar ku wan di civîna meclisa partiyê ya di 11'ê cotmehê de û civîna lijneya rêveberiya navendî ya di 2'yê mijdarê de, nîqaşên berfireh kirine û wiha got: "Rejîma heyî riziyaye û ji cewherê xwe dûr ketiye. Ev pir aşkera ye. Ev yek hatiye tespîtkirin. Ji bo ku em vê rejîma faşîst ser û bin bikin em ê bênavber dest bi çalakiyan bikin."... ***R.3***

## Hilbijartina DYA'yê

Hilbijartina serokatiya DYA'yê ya 59'emîn di 3'yê mijdarê de dest pê kir. Dema ev nûçe amade dibû Biden 264, Trump jî 214 delege bi dest xistibûn. Ji bo serokatiya Amerîkayê divê herî kêm 270 delege bên bidestxistin.Hilbijartin ne tenê di rojeva DYA'yê de ye, hemû cîhan niha hilbijartinê dişopîne. Heta niha îhtimala serketina Joe Biden zêde be jî encamên teqez diyar nebûne. ***R.7***



## Destana Egîdan

Qala "Destana Egîdekî" dihat kirin, ez wê çaxê ciwanek bûm. Min li helbesta Mehmed Uzun a bi dengê Ciwan Hacoyî guhdarî dikir. Ez li ber vê albûmê ji ser hişê xwe ve diçûm; weke zaroktiya xwe ku diçûm gund û li benda dîtina stêrkan dimam. Wexta min li vê albûmê guhdarî dikir... ***Mefer Kurdil / R.5***

## Ger jineolojî pêrgî zanistên zayendî bibe

Ji sala 2008'an vir 'jineolojî' wek termeke îdeolojîk û teorîk a wek 'zanista jin û jiyanê' ku ji hêla Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan ve hat pêşniyarkirin, ket rojeva Tevgera Jinên Azad a Kurdistanê. Ji hingê ve ye tevgera jinên azad teorî û metodolojiya vê ceribandina nû xistiye nav rojeva xwe û li ser vê bingehê xebateke transneteweyî dimeşîne. Di nav 12 salên derbasbûyî de sînorê jineolojiyê xwe gihand hemû parzemînên cîhanê. Li gelek welatan bi gelek saziyên têkoşer, femînîst û jinan ve konferans, sempozyûm, komxebat û hwd. hatin lidarxistin. Ji bo nasandina jineolojiyê li Ewropa, Amerikaya Latîn, li Rojhilata Navîn komîteyên jineolojiyê hatin avakirin... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***

## Gava ez bûm miftî

Havîna sala 1973'yan, bi selika tije fêkî û hin tiştên ruhin di nav de veşartî, min serdana girtiyên polîtîk ên li hepsa vekirî ya Amedê kir. Ev zindan dê bûbûya muze ku hîn jî temam nebûye. Li başûrê vê "muze"yê li binê bedenê jî mizgefta Silêman Pêxember heye. Rojek ji rojên payîza paşî, roja êvara înê, bi mamosteyê xwe Amed Tîgrîs re, me da rê ku em bizanibin muze qediyaye yan na. Ji deriyê Serayê heta bi devê deriyê "muzeya nû" û bedena li çemê Dîcleyê dinêre, ticaret, wahiz, qesîde, pars, xwendina hedîs û quranê, dê weledê xwe davêt... ***Seyidxan Anter / R.8***

# Ger jineolojî pêrgî zanistên zayendî bibe

Munewer Azîzoglu Bazan

**Ne bêdeng û ne jî lal bûn; gotina xwe bi xwe dianîn zimên û bi nav dikirin. Li xwebûna xwe xwedî derdiketin û bi serbilindî pênase dikirin. Ev yek efsûna hemû zanebûnan e. Jineolojî bi xweserbûn û bixwebawerbûna xwe bala cîhanê kişand**

Ji sala 2008'an vir ve 'jineolojî' wek termeke îdeolojîk û teorîk a wek 'zanista jin û jiyanê' ku ji hêla Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan ve hat pêşniyarkirin, ket rojeva Tevgera Jinên Azad a Kurdistanê. Ji hingê ve ye tevgera jinên azad teorî û metodolojiya vê ceribandina nû xistiye nav rojeva xwe û li ser vê bingehê xebateke transnetewî dimeşîne. Di 12 salên derbasbûyî de sînorê jineolojiyê xwe gihand hemû parzemînan. Li gelek welatan bi gelek saziyên têkoşer, femînîst û jinan ve konferans, sempozyûm, komxebat hatin lidarxistin. Ji bo nasandina jineolojiyê li Ewropayê, Amerîkaya Latîn, li Rojhilata Navîn komîteyên jineolojiyê hatin avakirin, berhem û nîqaşên di vê derbarê de bi nivîskî û nîgaşî tên weşandin.

Bi taybetî pêşketin û destkeftiyên Şoreşa Rojava ku wek Şoreşa Jinê li cîhanê deng veda, di bilindbûna eleqeya der barê jineolojiyê de roleke girîng lîstin. Jinên leheng ên li dijî DAIŞ'ê bi dilêrî şer dikirin û bi rûkenî jiyana xwe bedel didan, wek ne ji vê dinyayê dixuyan. Ev bû yekemîn sedem ku jineolojî bi balkêşî hat şopandin. Duyemîn sedema balkêşiya vê mijarê krîza jiyankirî ya tevgerên têkoşer, bi taybetî ya tevgerên femînîst bû. Lewre tevgerên têkoşer ên femînîst û jinan bi taybetî piştî salên 1968'an wek hêviyên tevgerên civakî dihatin dîtin lê mixabin di 50 salên derbasbûyî de li gel gelek destkeftiyên di asta takekesî û hêla civakî de ji hev belavbûn û marjînalîzebûn, nikaribû bê rawestandin. Ev jî lêgerîna jiyaneke din a alternatîf ne tenê di nav civakên, 'cîhana seyemîn' de, di heman demê de di nav 'cîhana yekemîn' de jî mezintir kir. Dibe ku di vê meraqê de hinek helwesta oryantalîst jî kêm nîn be û jixwe kêm jî nîn e. Bi taybetî şêrejintiya jinên kurd ku bi temeziyên xwe yên keskûsorûzer û bi keziyên xwe yên dirêj, an jî dayikên bi gulfîstan û dest bi çek, sînorê têgihîştina, estetîka rojavayî derbas dikir, bû serwêneya kovar û nivîsên rojavayî (Dirik). Li hêla din 'wêrekiya nezan û belengazên rojhilatî' her tim ji bo romantîzekirina wan deveran roleke guncav dilîst. Ev jî hişt temaşevan zêde bibin.

**Sempozyûma du têgehan**

Hefteya borî civîneke onlîne di vê çarçoveyê de hat lidarxistin. Di bin sîwana Tora Akademîsyenên Kurd, Zanîngeha Emden/Leer û Navenda Marie Jahodayê ya Zanîngeha Bochumê sempozyûmeke onlîne ya bi navê 'Jineolojî pêrgî zanistên zayendî dibe' hat birêxistinkirin. Bêwatebûna sînoran ku em di pêvajoya pandemiyê de yekser hest dikin, bi taybetî di civînên bi vî rengî de xwe nîşan didin. Ji her derên cîhanê kes dikarin tev li van civînan bibin û deng û nêrînên xwe tev li civînê bikin. Bi taybetî di nîqaşên wekhevî û cudahiyên femînîzman û têkoşînên cuda de mirov dikare rasterast girêdayî cih û kontekste mînakan bibîhîze, şîrove bike û bîne pêrgî hev- ger pêrgîdarî hewce be-.

Ev sempozyûm ji ber ku îdîaya zanistbûnê ya jineolojiyê xist navenda nîqaşan, balkêş bû. Lewre femînîzm û girêdayî wê zanistên zayendî ji zû de ye ji destpêka 1970'an vir de li zanîngehên bakurên cîhanê xwe sazî kirine. Destpêkê wek 'zanistên der barê jinê de' dû re wek 'zanistên zayendî' û her wiha wek beşeke pirdîsîplînî li seranserê cîhanê xwediyê bi sedan navend û saziyan e. Her çiqas dû re ev sazîbûn bi gelek rexneyan re bê nirxandin jî hin jî li van navendan bi hezaran lêkolîner der barê têkîliyên dîrokî yên zayendan û têkiliyên serdestî yên di navbera wan de lêkolîn dikin. Ev jî dihêle ku her tim gaveke zanistên zayendî di nav civakê de hebe. Rexneya sereke ya li hemberî sazîbûna zayendên zanistî xwe ji çalakbûn û têkoşîna pratîk qutkirin û girêdayî vê ji armanca sereke ya femînîzmê -ango guhertina rolên zayendî û guhartina civakê- dûrketin e. Ev di heman demê de rexneya jineolojiyê ji femînîzmê re ye lê wekî ku di nîqaşan de jî derket holê, ev rexne ne tenê ji hêla perspektîfa jinên kurd ve hatiye kirin. Li hêla din dîsa divê bê diyarkirin ku pêşketinên di nav femînîzman de li ser xetekê nameşin. Piralî û pirserî ne, di hev re derbas dibin, di nav xwe de nakokiyan dihewînin û li ser analîzên van nakokiyan bi pêş dikevin. Hem wek encama sempozyûmê û di nîqaşên navbera jineolojî û femînîzmê de dîsa piştrast bû ku di hemû têkoşînên di vê çarçoveyê de –xwe wek femînîst binavkirî yan jî nebinavkirî- hevpariyeke bingehîn heye: gumana ji têkiliyên serdestî, biryara azad a li ser jiyan û laşê xwe û parastina mafê bingehîn (Gonzalez).

**Tecrûbeyên jinên kurd**

Jineolojî di vir de wek modela tecrûbeyên jina kurd derdikeve pêş û îdîa dike û dibêje ez bi tecrûbeyên xwe û bi metodên xwe yên pêşxistî (wekî kuştina zilam, hevjiyana azad, qutbûna ji pergalê û hwd.) û her wiha di asta rêbazên rêxistinkirinê de dikarim ji hemû jinên cîhanê re bibim mînak (Nûdem û Guneser). Beşdarvanên sempozyûmê di axaftinên xwe de pêşketina dîrokî ya hemû aktoran pêşkêş kirin. Ev pêrgîdan ji xeynî nîşandana cihêrengiya têkoşînên jinan, cihêrengiya dîrokê jî nîşanî me da. Em di nav dîrokekê de derbas nabin. Çawa ku rexne li ser dîroknivîsiya zilam/spî/serdest tê kirin û tê gotin, dîrokeke jinê yan jî dîrokeke nenivîsandî jî heye; em bi mînakên curbicur dibînin ku dîrok jî ne yek e, ne li ser xetekê ye, ne dûz e, ne jî ji hev qetandî ye. Tecrûbeya jina kurd jî di vê çarçoveyê de derdikeve pêş. Têgehên xwe yên ku ji pratîka xwe ava kirine, teorîze dike. An jî berevajî vê teoriya xwe yekser dixe nav pratîkê. Ev di heman demê de hêz, an jî sedema îdîaya tevgera jina kurd û jineolojiyê ye. Li hêla din berxwedana wê ya daîmî û bênavber a li dijî baviksalarî û mêtingeriyê dê di cîhanê de dike mînakeke yekane. Ev bênavberbûn di heman demê de rêxistinbûna wê diparêze û qewîn dike. Her wiha konsepta xweparastina rewa (fîzîkî û zîhnî) ku di salên 1960-70'yan de ji hêla femînîstên radîkal ve ji bo parastina takekesî ya jinan wek metod derket pêş, li dijî êrîşên baviksalarî û mêtingeriyê, wek rêbazeke gerdûnî serkeftina xwe rewa kir.



Li hêla din, rexneya li ser pozîtîvîzmê jî ne kişfa jineolojiyê ye. Ji destpêkê heta îro zanistên li ser jinan û zayendî vê rexneyê li zanista serdest dikin û di analîzteşhîrê de jî qet kêm nemane. Pirsgirêka di vê mijarê de derdikeve holê awayê avakirina pêwendiya civakî ye. Xetere di rêzekirina pêwendiyan de derdikeve holê (Schäfers). Dema zanist ne li gorî civakê lê li gorî helwest, berjewendî û nêrîna xwe biryara pêwîst/nepêwîst bide, wê demê li wir ji têkiliyên serwerî xelasbûn ne mimkun e. Divê jineolojî di vê têkiliya zanistî û bingehîn a di navbera civak û zanistê de çavê xwe li edaletê negire. Cihê ku bi giştî zanist tê de fetisiye ev xal e. Ji dêlva civakê ve axivîn, îdîaya destpêkê dide windakirin.

## Xwebûn û bixwebawerbûn

Li hêla din di vî alî de tiştekî ku hemû zanebûnên rojavayî çeprast dikir diqewimî: Ev kes xwedî dev û ziman bûn; ne bêdeng û ne jî lal bûn. Gotina xwe bi xwe dianîn



zimên û xwe bi nav dikirin. Li xwebûna xwe xwedî derdiketin û bi serbilindî pênase dikirin. Ev yek efsûna hemû zanebûnan e. Ji kîjan hêla cîhanê dibî bila bibî, dema ne bi teqlîd lê bi xweser û bi xwe bawer derkevî ser dikê, balê dikişînî ser xwe. Jineolojî bi xweserbûn û bixwebawerbûna xwe bala cîhanê kişand ser xwe.

Di vir de mirov kevanekê veke, dê baş bibe. Lewre term û teoriyên wek jineolojiyê ku xwe li derveyî mainstreamê (di çarçoveya nivîsa me de li derveyî femînîzmê) pênase kirine, bi taybetî û tecrûbeyên xwe yên xweser esas girtine, li gelek deveran û di gelek deman de hebûn û hîn jî hene. Bi taybetî têkoşînên jinên reşik ên hem li Amerîkayê û hem jî li Afrîkayê mirov dikare wek mînak nîşan bide. Teorî û rexneyên ku ew bi pêş xistine, hiştine ku femînîzma rojavayî li ser xwe bisekine, serdestiya nav xwe bike pirsgirêk, cudabûna jinan û tecrûbeyên bindestbûnê yên ne wekhev bigire dest. Ev jî hiştiye ku femînîzm êdî bi pirjimarî tê binavkirin. An jî hin nêrîn û herikînên derveyî femînîzmê derketine pêş. Di vê qada pirzimanî û pirçandiyê de pirsa, 'nûbûna ku jineolojiyê derxistiye holê çi ye?' derdikeve pêşberî me û ev yek dibe mijar an jî naveroka civînên transnasyonal ên der barê jineolojiyê de.



## Bi kampanyaya 'Em xwe diparêzin' ber bi 25'ê Mijdarê ve

Kampanyaya Tevgera Jinên Azad (TJA) ku nêzî du meh berê bi navê 'Em xwe diparêzin' li dijî tacîz, tecawiz, destdirêjî, qeyûm, tecrîd, talankirina xwezayê û her cure êrîşên li jinan dabû destpêkirin, bajar bi bajar, tax bi tax û kolan bi kolan didome. Kampanya li her derê ji aliyê jinan ve rastî eleqeyeke mezin tê.

Di çarçoveya kampanyayê de, aktîvîstên TJA'yê tevî hemû astengiyan jî li gelek bajaran bi jinan re tên gel hev, têkildarî kampanyaya jinan agahdar dikin û civînan li dar dixin.

Di civînan de jin bal dikişînin ser tundî û qetilkirina jinan ku gihîştiye asteke pir bilind û li ser 'em ê çawa xwe û civakê li dijî van êrîşan biparêzin' dinirxînin.


Li aliyê din jî bi nêzîkbûna 25'ê Mijarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Jinan, TJA li gelek bajaran starta çalakiyên 25'ê Mijdarê da. TJA dixwaze di çarçoveya kampanyaya 'Em xwe diparêzin' de ji bo 25'ê Mijdarê çalakiyên hîn xurttir pêk bîne.

Meclisa Jinan a HDP'ê jî bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku dê ew bi dirûşma 'Em li dijî tundiya dewleta mêr têdikoşin' di 7'ê mijdarê de li hin bajaran dest bi çalakiyên 25'ê Mijdarê bikin. Dê meclise li van bajaran tevî platform û rêxistinên jinan meş û xwepêşandanên hevpar li dar bixe, karê xweser bimeşîne, li kolanan çalakiyên xurt li dar bixe, serdana gund, tax û malan bike. **AMED**

# Qetilkirina kurdan li gorî mevzûatê ye!

Leşkerên ku li navçeya Geverê ya Colemêrgê derketin operasyona leşkerî welatiyê bi navê Şeralî Derelî û kolberekî ji rojhilatê Kurdistanê qetil kirin. Têkildarî qetilkirina du kesên sivîl walîtiya Colemêrgê got ku Derelî li gorî mevzûatê hatiye kuştin

Navenda Nûçeyan



Zilm û zordariya dewletê ya li hemberî welatiyên sivîl ên kurd berdewam e. Hefteya borî bûyereke mîna bûyera ku di meha îlonê de li navçeya Şaxê ya Wanê qewimîbû li navçeya Geverê ya Colemêrgê pêk hat. Leşkerên ku derketin operasyonê li gundê Avyan ê bajaroka Bajêrganê ya Geverê welatiyê bi navê Şeralî Derelî qetil kirin.

Leşkeran piştî ku Derelî qetil kirin, bi saetan nehiştin ku xizm û gundiyên Şeralî nêzî cenazeyê wî bibin. Ji ber vê yekê cenazeyê Derelî bi qasî 6 saetan li ber çavê malbatê li erdê hat hiştin.

**Pêşî derp kirine**

Weke hemû bûyerên bi vî rengî ku bi serê kurdan de tînin, walîtiya Colemêrgê li şûna leşkerên kujer Derelî sûcdar kir. Walîtiyê bi awayekî sosret ragihand ku Derelî li gorî mevzûatê hatiye kuştin!

Malbata Derelî bi awayekî tund bertek nîşanî daxuyaniya walîtiya Colemêrgê da. Kurê Derelî Sûltan Alî Derelî der barê kuştina bavê xwe de got ku pêşî leşkeran bavê wî bi awayekî hovane derp kirine û piştre jî gule lê reşandine û ew kuştine.

**Birin rojeva meclisê**

Di dîmenên ku dema cenazeyê Derelî di destê leşkeran de ye jî biraziyê wî bertek nîşanî leşkeran dide û dibêje ku apê wî bi reşandina gelek guleyan hatiye kuştin.

Parlamenterê HDP'ê yê Colemêrgê Saîd Dede û parlamanterê CHP'ê yê Stenbolê Sezgîn Tanrikûlû, kuştina Şeralî Derelî bi pêşnûmepirsan birin rojeva meclisê û xwestin ku der barê kuştina wî de li leşkerên kujer doz bê vekirin û bên cezakirin.

Li gel vê hewldana siyasetmedarên kurd jî 5 leşkerên ku ji ber kuştina Derelî hatibûn binçavkirin, piştî gotina dayîna xwe ya dozgeriyê hatin berdan.

Heyeteke ku ji hevserokên KCD û DBP'ê û parlamenterên HDP'ê pêk dihat çû gundê Avyanê û serdana malbata Şeralî kir. Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk di serdanê de got ku ew komkujiyên li hemberî kurdan qeyd dikin û roj were dê hesabê komkujiyan ji dewletê bipirsin.

**Kolberek jî qetil kirin**

Piştî vê bûyerê bi 3 rojan leşkerên tirk li heman navçeyê êrîşî kolberên kurd ên ji rojhilatê Kurdistanê kirin. Leşkeran kolberê bi navê Misleh Kasimî qetil kir û birayê wî Mislim Kasimî jî birîndar kirin.

Der barê van leşkeran de jî tu doz nehat vekirin û kuştina kurdan ji wan re ma.

## HDP dest bi çalakiyên bênavber dike



Berdevka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Ebru Gunay, li navenda giştî ya HDP'ê civîneke çapemeniyê li dar xist û Bernameya Serdema Nû ya Çalakiyan a partiya xwe aşkera kir. Gunay diyar kir ku wan di civîna meclisa partiya wan a di 11'ê cotmehê de û civîna Lijneya rêveberiya navendî ya di 2'ê mijdarê de nîqaşên berfireh kirine û wiha got: "Rejîma heyî riziyaye û ji cewherê xwe dûr ketiye. Ev pir aşkera ye. Ev yek hatiye tespîtkirin. Ji bo ku em vê rejîma faşîst ser û bin bikin em ê bê navber dest bi çayakiyan bikin."

Gunay bi lêv kir ku biryar dane bi dûrişmeya 'Li dijî faşizmê berxwedan, ji gelan re demokrasî û edalet' Bernameya Têkoşîna Demokratîk bidine destpêkirin û ev tişt anî ziman: "Hûn dizanin ku em ji meha hezîranê ve di nav çalakiyên domdar de ne. Bernameya Têkoşîna Demokratîk ku me niha amade kiriye, gaveke nû ye. Ji ber em demokrasiyê dixwazin, asimîlasyonê red dikin, civakê diparêzin êrîşê me dikin."

**Banga tifaqa gelan**

Di berdewamê de Gunay bal kişand ser armanca çalakiyên wan û der barê mijarê de ev tişt got: "Em naxwazin girtîgeh û goristan tije bibin. Ev bername ji bo pêşeroja zarokên me ye. Bi vê bernameyê, em xwedî li keda xwe derdikevin. Em dizanin zordar jî bêçare ne û êrîşî me dikin. Werin em li hemberî faşîzmê tifaqa gelan ava bikin. Sebra me êdî nemaye. Lewma em bangî raya giştî dikin û dibêjin; tevgera me ya hêvîdaran e û cihê me ne li qesran e. Em li kolanan in. Em xwediyê heqîqetê ne."

**'HDP partiyeke xurt e'**

Di dawiya daxuyaniyê de Gunay, pirsa der barê daxuyaniya serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû ku gotibû, 'Dixwazin ji nav HDP'ê partiyek derxin' de wiha bersivand: "Kes nikare ji nav HDP'ê partiyeke din derxe, partiyeke ava bike. HDP partiyeke pir xurt e, ev nêrîna wî ye lê bingeha vê yekê tuneye. HDP partiyeke demokratîk e, her nîqaş bi awayekî demokratîk dikare xwe îfade bike." *ENQERE*



## Bîlançoya erdheja Îzmîrê

Hefteya borî di 3'yê mijdarê de li Îzmîrê erdhejeke bi pileya 6.6 pêk hat. Navenda erdhejê navçeya Seferîhîsarê ya Îzmîrê bû. Ji ber ku pileya erdhejê mezin bû xesareke mezin gihîşt bajar û gelek kes di erdhejê de birîndar bûn û jiyana xwe ji dest dan.

Xebatên lêgerîn û rizgarkirinê yên erdhejê di nav hefteyê de bi dawî bûn û bi vê re bilançoya erdhejê jî derket holê. Li gorî daneyên Serokatiya Rêveberiya Rewşa Awarte û Karesatê ya Wezareta Karên Hundir (AFAD), di erdhejê de 114 kesan jiyana ji dest daye, hezar û 35 kes birîndar bûne û 137 kes jî bi saxî hatine rizgarkirin.

Wezîrê Bajarvanî û Hawirdorê Mûrat Kûrûm jî di nav hefteyê de der barê encamên erdhejê de daxuyanî da û ragihand ku di erdhejê de xesar gihîştiye 2 hezar û 508 avahiyan û ji van avahiyan 12 heb hilweşiyane. *ÎZMÎR*

## Rapora binpêkirina mafê rojnamegeran

Li Tirkiyeyê rojnamegerên ku rastiyê radigihînin û li gorî daxwaza hikumetê tevnagerin di hedefa desthilatê de ne û li hemberî wan operasyonên binçavkirin û girtinê tên kirin. Ji ber vê her roj li edliyeyên Tirkiyeyê dozên rojnamegeran û bi dehan rojnameger ji ber xebatên xwe yên rojnamegeriyê tên darizandin.

Der barê binpêkirinên mafên rojnamegeran de Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê (DFG) di nav hefteyê de rapora xwe ya meha cotmehê aşkera kir. DFG'ê di daxuyaniya xwe de binçavkirin û girtina nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) ya ji ber derxistina holê ya avêtina welatiyen sivîl a ji helîkopterê bi bîr xist û diyar kir rojnameger bê sûc û bê sebeb tên binçavkirin û girtin.

**4 rojnameger girtine**

Li gorî rapora DFG'ê; di meha cotmehê de 11 rojnamevan hatin binçavkirin, 4 jê hatine girtin, gef li 4 rojnamevanan hatiye xwarin, 3 rojnamevan dema ku nûçe şopandine hatine astengkirin, 2 rojnamevan ketine ber lêpirsînê, doz li 5 rojnamevanan hatiye vekirin, li 5 rojnamevanan 7 sal û 11 meh cezayê girtîgehê û 3 hezar û 650 TL jî cezayê pere hatiye birîn.

Li gorî raporê li Tirkiyeyê 91 rojnamevan jî girtî ne. *AMED*

DÎCLE FIRAT GAZETECİLER DERNEĞİ

# Di ser darbeya siyasî re 4 sal derbas bûn

Qedrî Esen

Di ser operasyona mezin a li hemberî HDP'ê ya 4'ê Mijdara 2016'an pêk hat re 4 sal derbas bûn. Piştî serkeftina HDP'ê ya di hilbijartina sala 2015'an de, AKP'ê Pêvajoya Çareseriya Demokratîk ku HDP'ê bi rê ve dibir bi dawî kir. Bi dawîkirina pêvajoyê re HDP'ê ji xwe re kir hedef û dest bi terorîzekirina wê kir.

Li gel van hewldanên xwe jî nikaribû bi tena serê xwe pêşî li HDP'ê bigire. Ji bo vê yekê bi partiya nijadperest a tirk MHP'ê re tifaqeke faşîst ava kir û ket nav hewldanên xitimandina siyaseta HDP'ê. Bi rakirina destnedayîna parlamenterên HDP'ê dest bi êrîşên xwe yên li hemberî HDP'ê kir.

Piştî rakirina destnedayîna parlamanteran Serokkomar Tayyîp Erdogan gefa girtinê li parlamenterên HDP'ê xwar. Piştî van gefan 4'ê Mijdara 2016'an li dijî HDP'ê operasyoneke mezin pêk hat.

Di vê operasyonê de hevserokên giştî yên HDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Fîgen Yuksedag jî di nav de 12 parlamenterên HDP'ê hatin binçavkirin û piştre piraniya wan hatin girtin.

Ji vê rojê şûn de êrîşên li hemberî HDP'ê mezin bûn û bênavber hatin berdewamkirin. Hefteya borî bi munasebata salvegera roja vê operasyonê ji aliyê HDP'ê ve çalakiyên şermezarkirinê hatin lidarxistin û daxuyanî hatin dayîn.

Hevseroka giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan jî li meclisê di komcivîna partiya xwe de bal kişand ser vê operasyona li HDP'ê û got ku operasyona li dijî vîna gel û parlamentoyê pêk hatiye.

Di hemû çalakî û daxuyaniyên HDP'ê yên der barê operasyonê de HDP'iyan operasyonê weke Darbeya Siyasî ya 4'ê Mijdarê bi nav kir û destnîşan kirin ku bi darbeyê serberjkêkirin û çokşikandina kurdan hatiye xwestin.

HDP'ê der barê "Darbeya Siyasî ya 4'ê Mijdarê" de pêşniyaznameyekê da meclisê û xwest ku pêkanîna dijhiqûqê û texrîbatên civak û demokrasiyê yên bi vê operasyonê pêk hatine bên lêkolînkirin. Pêşniyaz bi dengên parlamenterên AKP-MHP'ê hat redkirin.

Di hefteya salvegera vê operasyonê de jî operasyonên li HDP'ê ranewestiyan û di van operasyonan de bi dehan HDP'î hatin binçavkirin û parlamenterê HDP'ê yê berê yê Rihayê Îbrahîm Bînîcî jî di nav de gelek kes jî hatin girtin.



## XWEBERDAN MIRIN E, BERXWEDAN JIYAN E

# Vebijêrkeke din nîn e

Rizoyê Xerzî

*Wekî dibêjin 'Çiya li çiyayan rast nayên lê mirov li hev rast tên', li pey salên dûr û dirêj ku derdora 11 salan di zindanê de ma, em û Hemîd Dilbihar dîsa li hev rast hatin. Ji bo xwînerên Xwebûnê vê carê jî me bi helbestkar û nivîskar Hemîd Dilbihar re hevpeyvîn kir.*

**Tu bi xêr hatî. Gelek derbasî be. Li gel ew qas salên di girtîgehê de, me tu weke her carê dîsa bi coş û delodîn dît. Tu weke her carê dîsa dilbihar î.**

Destpêkê we û hemû xwînerên Xwebûnê bi hezkirin û rêzdarî silav dikim. Gelek spas. Min jî tu wisa dîtî. Têkoşîna di rêya azadî û mirovahiyê de, mirovan her tim, ciwan, têrjîn, delodîn û dilbihar dihêle.

**Gelek rojnameger û nivîskar bi hincet û angaştên cuda tên girtin. Gelo tu bi çi angaştê hatibûyî girtin û tawanbarkirin?**

Ya rast bersiva vê pirsê, kêm zêde her kurd û mirovek azadîxwaz dizane. Ku tu li dijî serdestî û desthiladariyê, li dijî her cureyê dagirkerî, mêtingerî û koledariyê derkevî, ji dil û can li ber xwe bidî, ji her milî ve têbikoşî, di her şert û mercan de xwe-bûn û nirxên xwe yên kurdewar û gerdûnî biparêzî di encamê de dîlketin, ango girtin jî heye. Ji bo vê jî serdest û desthiltdar dikarin bi sedan sedem û hincetan nîşan bidin. Di şert û mercên dijmirovahiyê de, kurdbûna te ya birûmert û têkoşîna te ya bo azadî û mirovahiyê bi tena serê xwe besî dîlgirtina te ye. Armanca desthilatdaran a dîlgirtinê pêşîlêgirtina berxwedan û têkoşînê ye. Di rastiya xwe de, angaştên wek sedema dîlgirtina min hatibûn nîşandan jî gotin, kiryar û çalakiyên di çarçoveya parastina nirxên kurdewar ên neteweyî, têkoşîna hebûn, xwebûn û azadiya gelê kurd û hemû kom û gelan de bûn û ev ne tawan lê rûmet û serfiraziyeke mezin e. Bêguman, weke her berxwedan û têkoşîneke dîrokî ya mirovahiyê, ev berxwedan û têkoşîn jî dê di rûpelên dîroka mirovahiya azad û serfiraz de cihê xwe bi awayekî herî nirxdar bigire.

**Gelo armanca girtîgehê çi ye; desthilatdaran risteke çawa li girtîgehê bar kiriye?**

Berî her tiştî zindan alav û amûreke herî bingehîn a desthilatdaran e; li dijî hemû kes, derdor, kom û gelên azadîxwaz û li derveyî qada desthilatdariyê wek çekeke tepisandin, dîlgirtin, radestgirtin û jiholêrakirina ji gelek milan ve ye.

Em dikarin zindanên niha weke dojeheke modern bi nav bikin. Ev dojeha modern, cihekî herî taybet û xedar e ku azadî û serbestbûna mirovan a fizîkî ji holê radike; wan ji xwezayê, civakê, jiyana civakî û ji hemû nas, heval, hogir û hezkiriyên wan dûr dixe. Ji her tiştê ku ew xwe parçeyek ji wan dibînin an jî wan parçeyek ji xwe dibînin, dûr dixe. Jixwe, armanc û sedema hebûna zindanên em behs dikin ew e ku dîlgirtiyên siyasî/polîtîk, têkoşerên azadî û mirovahiyê ji hest, raman, giyan, armanc û xeyalên wan ên takekesî, civakî û gerdûnî dûr bixe; wan bi rê û rêbazên cur bi cur ji her milî ve dorpêç bike û di wan de kesayeteke li gor pergala desthilatdar saz bike; bîr, bawerî, hêvî û vîna wan bişikîne û wan bikişîne nava tora xiyaneta li hest, raman, armanc, xeyal, giyan û jiyana wan. Ji bo vê jî her cureyê pêkanînên taybet ên li dijî mirovahiyê ji aliyê desthilatdaran ve tê bikaranîn. Bêguman, li gel hemû pêkutî, zext, zordarî û êrîşên fizîkî, herî zêde jî zext, êrîş û pêkanînên li dijî dil, hiş û giyanî rû didin.

Li gel vê yekê, di nav dest û lepên dojeha modern de jî be, hemû dîlgirtiyên polîtîk ên berxwedêr û têkoşer li dijî vê rewşa li derveyî zagonên xweza, jiyan, civak û mirovahiyê ji her milî ve li ber xwe didin û têdikoşin; bi taybetî jî ji milê hest, raman, giyanî û manewî ve. Vê jî di her qad û kêliya jiyanê de, ji her alî ve bi sekna xwe ya xeta berxwedêrî, bi xebat û hilberînên xwe yên nivîskî nîşan didin. Ango, dîlgirtiyên polîtîk di zindanan de di nav şert û mercên dojehî de be jî bin, dest ji berxwadana parastina nirxên xwe yên bingehîn bernadin. Baş dizanin ku xweberdan mirin e, berxwedan jiyan e. Li gel wê di heman demê de gelek ji wan, heta dawiyê hewl didin ku binivîsin û berhemên nivîskî hilberînin ku nivîsandin û hilberandina berheman ji bo wan cureyekî berxwedaneke parastina nirxên hebûn û xwebûna wan, parastina hest, raman, armanc, xeyal, manewiyat û jiyana wan e.

Ez dikarim rewşa xwe ya di zindanê de di vê çarçoveyê de bi lêv bikim. Ango, di nav çar dîwarên dojehê de be jî bi bo min di her qad û kêliya jiyanê de berxwedan, têkoşîn û hilberîna esas bû.

**Weke em dizanin di zindanê de tu jî çend caran rastî êrîş û îşkenceyên fizîkî hatî. Helwesta te ya li dijî vê çi bû?**

Belê, ez jî weke gelek dîlgirtiyên azadiyê, bi caran ji aliyê hêzên serdest û desthilatdar ve rastî êrîş û îşkeceyên fizîkî hatim. Bersiva li dijî vê jî weke her carê xurtkirin û kûrkirina bîr, bawerî, daxwaz, hêvî, hezkirin, vîn, evîn, dildarî û biryardariya têkoşîna azadî û mirovahiyê, berxwedan, têkoşîn û hilberîn bû. Ev yek dê heta hilma dawî jî bidome ku ji bo her mirov û kurdeke/î birûmet û serbilind ji bilî vê rê û vebijêrkeke din nîn e. Ez bawer im ku 2023 dê bibe sala kurdan û wêjeya kurdî.



> Dema ez di zindanê de bûm, min biryar da ku heta ez ji nav wan çar dîwarên dojehî dernekevim, heta dernekevim nav serê çiyayan û giyanê min bi per û bask nebe ez tu berhemeke xwe naweşînim û sala 2023'yan dê bibe sala wêjeya kurdî

**Tu vê carê nêzî 11 salan di zindanê de mayî. Gelo te dema xwe ya di zindanê de çawa derbas kir, te çi berhemên wêjeyî nivîsandin?**

Belê, wek tê zanîn zindan jî qadeke têkoşînê ya bingehîn e. Ji ber wê, di zindanê de jî ji gel hemû şert û mercên dojehî jiyan, têkoşîn û berhemdarî didome. Min jî li ser vê bingehê, li gel kar, bar, xebat û têkoşîna rojane ya gelemperî û hevpar, xebatên xwe yên ziman û wêjeyî bênavber domandin.

**Bêguman, te niha gelek berhemên wêjeyî nivîsîne lê bawer im te hîn çap nekirin. Sedemeke vê heye gelo?**

Rast e, wek te jî got min gelek berhemên kurdî yên wêjeyî nivîsîn, saz kirin lê nedane weşandin. Lewra dema ez di zinadanê de bûm min biryar da ku heta ez ji nav wan çar dîwarên dojehî dernekevim, heta li ser axê nemeşim û piyên min bi wê şa nebin; heta dernekevim nav serê çiyayan û wek xezalan xwe nehilavêm li ser lat û zinaran, giyanê min bi per û bask nebe û weke balindeyan bi bayê çiyayan re nereqise, xwe bernedim nava dil û cerg û hinavên geliyan û dilê min weke rûbarekî delodîn neherike, li gel avêtina berbangeke nû hişê min li ser bircên Amedê roja sorgevez neke taca serê xwe, bextê min xwe bernede nava deryaya Wanê û bi delodînî şipşîn pêl nede; li tax û qad û kolan û kuçeyên Kurdistana xwe li gel xwişk û bira, heval û hogir, nas û azadîxwazan govenda giyanazad negerînim û piştî wê jî tiştên ku min nivîsîne ji nû ve saz nekim naweşînim. Ev yek jî dê herî kêm du sê salên min bigire. Ango, ez ê berhemên xwe di sala 2023'yan de li ser hev biweşînim.

**Dîroka 2023'yan balkêş e. Gelo te ev dîrok bi taybetî diyar kir?**

Belê ku roj hat ez ê sedemên wê jî parve bikim. Hêvî û baweriya min ew e, 2023 dê bibe sala kurdan û sala wêjeya kurdî.

**Tu demeke dirêj ji civakê dûr mayî. Li gor çavdêriyên te guherîn û veguherîneke çawa di nav civakê de pêk hatiye?**


Bêguman di vê gerdûnê de koma heybera herî zindî û pêşketî koma mirovan, ango civak e. Ji ber vê jî çi tişt hindî mirovan naguhere û venaguhere. Di nav van deh salên dawiyê de jî ji ber gelek sedeman di serî de ji aliyê civakî, çandî, hişmendî, sincî û ji gelek aliyan ve gelek guhertinên girîng pêk hatine. Helbet hinek ji wan erênî ne, hinek ji wan neyînî ne. Di serî de qada siyaseta demokratîk divê em hemû kes, qad û derdorên azadîxwaz, têkoşer û civakparêz, bi awayekî herî rast û guncav xwe li gor van guherîn û veguherînan ji nû ve saz bikin; hemû rê, rêbaz, alav, amûr, bername, plansazî, têkilî, biryar û kiryarên xwe yên têkoşînê bi rengekî herî afirîner û dewlemend nû bikin û li gor wê tevbigerin da ku bikaribin bi ser bikevin. Sedemeke bingehîn a hemû kêmasî, nebesî û pirsgirêkên qada siyaseta demokratîk û hemû qadên din ên têkoşînê ev e.

**Wek em dizanin, ji destpêkê heta niha tu ji bilî helbestkarî û nivîskariyê di gelek qadên din de cih digirî. Yek ji wan jî qada civakî ya polîtîk e. Bo çi ev qad gelo?**

Di serî de bêjim ku di wateya berfireh de hemû qad û kêliyên jiyanê polîtîk in. Li gor vê rastiya bingehîn, li welat û cîhaneke bindest û xwelîser ên ku ji bêriya azadiyê her kêliyê agirekî dojehî xwe berdide cerg û dil û hinavan, têkoşîna polîtîk a şoreşger berî her tiştî maf û berpirsyariyeke mirovî, wijdanî, sincî, civakî, neteweyî, xwezayî, jiyanî û gerdûnî ye. Jiyan û civateke azad bi şoreşa hişmendî û sincî tê sazkirin. Pêkanîna vê jî bi polîtîkayeke şoreşgerî, ango bi şoreşeke hişmendî, sincî û polîtîk pêkan e. Bêguman ev jî bê kiryar û çalakiyên şoreşger nabe. Lewra, zagonên herî dîrokî, civakî, xwezayî û gerdûnî şoreşger in. Nivîskariya min bixwe jî di bingeha xwe de encama têkoşîna şoreşger a civakî û dîrokî ye. Jêderk û çavkaniya xwe jî ji wê derê digire. Em jî bi wê û ji bo wê hene, dê bi wê û ji bo wê hebin. Rêya serkeftinê ev e.

**Gelek spas dikin. Hêvîdar im ku ji niha şûn de jî tu di hemû kar û xebatên xwe de serkeftî bî.**

Ez jî spas dikim. Baweriya min jî ew e ku hemû kurd-î-parêz û azadîxwaz jî dê bi ser bikevin. Lewra ji bilî serkeftina di rêya azadî û mirovahiyê de her encam mirineke cuda ye. Em jî naxwazin bimirin, dixwazin bijîn. Ji ber wê em dê bi hev re bi ser bikevin, bi hev re bijîn...



## Hemîd Dilbihar kî ye?

Li gel helbestkarî, nivîskarî û rewşenbîriya xwe, xwedî nasnameyeke piralî ye. Pêşeng û têkoşerekî zimanê kurdî ye. Di gelek qadên têkoşînê yên wek ziman, çand, civakî û polîtîk de xebat kirine. Bi salan di rojnameya Azadiya Welat de qunciknivîsarî kir û di gelek kovaran de nivîsên wî hatin weşandin. Bernameyên televîzyonê amade kirin. Heta niha 4 pirtûkên wî hatine weşandin; Ji Evîna Te 1-2, Dem Bûye Xencereke Reş - Ezîzam, Piştî Tu Çûyî.

# "Destana Egîdan"

Mefer Kurdil



Yek ji wan Reşo bû lê dema ez li navê wan rast hatim ez hîn nû lê hayî bûm ku ev destan û ew destana zaroktiya min a gundiyan qal dikir yek bûn. Reşo, Rewşen, Doktor Kemal, Nûman û Hogir

Ez zarokekî 12-13 salî bûm, li bajarekî bi deşteke mezin, ji gundekî li nav çiyayan. Li bajarekî mezin hatibûm dinyayê, li xerîbiyê lê li navçeyeke welêt dijiyam, wer guhê min û dilê min li ser gundê bav û kalan bû. Min digot çima em jî ne li gundan in; çima bajar nexweş in. Em carinan bi mêvandarî diçûn gund û dihatin, şevina venedigeriyan, li wir diman. Gelek şevan li benda dîtina heyv û stêrkan dimam, min tu carî ew nedidîtin!

Gelek şevên min di navbera gund û bajaran de dibihurîn. Di wan demên zaroktiya min de, piştî wexteke kin tofaneke mezin li gundên di nav çiyayan de rabûbû, gund û dehl xerabûbûn, stêrk xuya nedibûn. Gundiyan digot, pênc stêrk ji ezman daketibûn nav gundan bi şev û roj li ber xwe dabûn lê bi ser neketibûn. Gundiyan wexta ku qal dikirin weke bi ser ketibin û nemirbin qal dikirin. Ji ber ku ez zarok bûm, ez baş li ber nediketim bê kî bi ser ketibû, çi bûbû? Weke xewnên şevan du nav di bîra min de mabûn Diktor û Rewşen! Gundiyan digot, ev destanek bû, berxwedanek mezin bû erê, bi serneketin lê felek rakiribûn li biniya siya Girêşêran, agirekî hew vedimire vêxistibûn ji bo ronahiyê! Jixwe piştî vê bûyerê bi 5-6 mehan gund hatibûn valakirin, hatibûn şewitandin, gundî koçber bûbûn. Dar û ber hişk bibûn, çem miçiqîbûn... Ew gundiyên ku ji bo dora ava kaniyan, ji bo darekê şer dikirin, ji bo "ronahiyê" nêzî deh salan gundên xwe nedîtin. Ev di jiyana min de destana ewilî bû min ji gundiyan guhdarî kiribû.

Ya duduyan qala "Destana Egîdekî" dihat kirin. Ez wê çaxê ciwanek bûm. Min li helbesta Mehmed Uzun a bi dengê Ciwan Hacoyî guhdarî dikir. Ez li ber vê albûmê ji ser hişê xwe ve diçûm, weke zaroktiya xwe ku diçûm gund û li benda dîtina stêrkan dimam. Wexta min li vê albûmê guhdarî dikir, min çavên xwe digirt di mejiyê min de stêrk diçûn û dihatin; gund û bajar xera dibûn û ji nû ve ava dibûn; wexta min guhên xwe dida vê muzîka Ciwan Hacoyî min ji xwe re digot navê wê çima ne "Destana Egîdan" e. Min wê çaxê nizanîbû Mehmed Uzun ewilî navê wê kiriye "Mirina Şervanekî", ji bo mirina Ferhat Uzun nivîsîbû...

Helbesta Mehmed Uzun ji bo rihê merivê xwe Reşoyî anî bû zimên bi muzîka Ciwan diherikî mîna rûbaran. Ger Ciwan çiyayek bûya, ew ê serê wî çiyayî cihê herî bilind û xweş navê wê "Destana Egîdekî" bûya.

Ew destaneke wisa bû, bi salan min lê guhdarî dikir deng û muzîk û gotin çawa wanî li hev hatibûn ez lê şaş dimam... û gelek caran rihê min li ber vê stranê parçe parçe dibû. Rojekê ji min re bû meraq ew hevalên Reşo kî bûn? Mehmed Uzun gotibû:

"Em pênc kes, ew pênc hezar kes
Em pênc hezar dil, ew pênc dil
Em pênc hezar dilên biheq,
ew neheq!"

Belê, jixwe me "pênc hezar dilên neheq" baş nas dikirin lê ew pênc kesên din kî bûn, yek jê Reşo bû lê ew çarên din kî bûn? Ew ên digotin:

"Xebera mêrxasiya me bigihînin bi însan û gelên me..."

Wexta ez bi dû vê agahiyê ve çûm û ez li navê 4 hevalên Reşo rast hatim û ez li navê gundên Biloka, Babina û Emrûd rast hatim, ez hîn nû lê hayî bûm ku ev destan û ew destana zaroktiya min a gundiyan qal dikir yek bûn. Reşo, Rewşen, Diktor Kemal, Nûman û Hogir...

Min wê gavê berê xwe da çiyayê Girêşêran û li xwe hayî bûm. Min got, rast e, ev destan "Destana Egîdan" bû!

Divê min bêhtir qala muzîka vê albûmê bikira lê ji muzîkê bêhtir rihê muzîkê min dikişîne; divê em bi muzîka xwe re bibin dilên heq û tu carî ji hevdu dûr nekevin! Mîna lihevkirina Paolo û Knût û Ciwan!

Di muzîka kurdî de rihekî mirov li dû xwe dikişîne û dibe zaroktiyê heye. Ji ber vê yekê ye di vê albûmê de rihê Ciwan û Mehmed Uzun û ên pênc stêrkan dibe yek û di mejî û dilê mirovî de cih digire. Tenê ne muzîkeke baş e, Ciwan di vê albûmê de weke şanogerekî muzîkal ava kiriye di dîroka muzîka kurdî ya modern de.

Ji ber ku rihê muzîka wî heye ew bûye Ciwan! Muzîka wî bi "dev, por, evîn, dayik, xwişk, bira, gund, heval, zozan, dinya, evîn, hêvî..." ye! Bi rih e! Stêrka muzîka kurdî ye evîna dilê Ciwanî! Ronahî ye! Bi hêviya ew dil û ew ronahî tu carî wenda nebin.


# Çîroka Mele Remezan û mirovekî bêçare

Adil Başaran

Mirovê feqîr, bavê wî diçe ber dilovaniya xwe. Cara ewil e ku ji malbata wî yek çûye rehmetê. Mirovê feqîr tu carî neçûbû ser mirî û goristanan.

Di emrê xwe de neçûbû serxweşî û mizgeftan lê vê carê bavê wî rehmet kiribû. Dest û lingên wî li hev geriyabûn hew dizanibû wê meytê bavê xwe çawa rake.

Axir dostekî bavê wî yê mele hebû û hema berê xwe da mala dostê bavê xwe û xwe avêt mala wî.



Mele dema derî vekir dît ku lawê dostê wî Xelîlo ye. Xwêdana li ser rûyê wî zîpik zîpikî ji jor de dikeve ser sînga wî û bi kelecan ji mele Remezanê dostê bavê xwe re got: "Mele Remezan, bavê min mir, ez çi bikim? Ma bavê min ê mirinê bû; ma qey di emsalê wî de mirov hebûn; de ka ji min re bêje ez ê çi bikim?

Mele Remezan destê xwe di serê Xelîlo re bir û anî û jê re got: "Serê te sax be." Melê da pêşiya Xelîlo û çûn ser meytê bavê wî. Wî rakirin, şûştin û birin goristanê. Tevî mele, li ser goristanê 5 kes temam bûn. Ji ber ku kesekî feqîr bû, tu kes nehat ser gora bavê wî û alîkariya wî nekirin.

Xelîlo gelekî li ber mirina bavê xwe ketibû. Mele li ser piyê qebrê li ser tutikan bi her du destan veşartina meyt nîşanî Xelîlo da lê devê Xelîlo ji girî bi zor digeriya û ji mele Remezan re got:

"Seydayê min ma qey bav, mîna bavê min hatibû dinê, de ji kerema xwe re tu jî dakeve hundirê tirbê da ku tahdeyî li bavê min nebe were alîkariya min bike."

Mele ew neşikand û daket gorê. Pişta wî da bakur û serê wî zîvirand; berê rûyê wî da qibleyê û derket. Paşê bi hev du re ax avêtin ser.

Xelîlo li hawirdora xwe meyzand. Li ser goristanê tevî wî û mele 5 kes hebûn. Dilê wî bi wî şewitî û di dilê xwe de got, niha ez kesekî dewlemend bûma dê hemû gundî bihatana ser gora bavê min û ji mele re got: "Seydayê min tu çiqas pere bixwazî ez ê bidim te. Li ser bavê min ayet û yasînan bixwîne, dia û fatîheyan bixwîne.

Mele Remezan jî dilê wî nehişt û dest bi xwendina ayet û yasînan kir, piştî ku belav bûn ji mele re got: "Ez dixwazim mewlûdekê ji bo bavê xwe bidim lê perê ku ez pê kar û berxan bikirim tune. Ma nabe ku ez çend mirîşkan bikirim û tu jî mewlûdekê li ser bixwînî?" Mele gelek dilê wî pê şewitî û got: "Çima nabe? Dibe dibe." Hema Xelîlo destê xwe avêt berîka şelwarê xwe û pere derxist, xist berîka kirasê melê û ji melê re got hema hindik be jî tu yê qebûl bikî, bavê min şêrê serê çiya û zozanan bû.

Dema mele nêzî malê bû meraq kir û destê xwe avêt berîka kirasê xwe. Destê xwe di berîka xwe de bir û anî. Dema pelek kaxiz ket destê wî derxist dît ku tenê 5 hezar kaxet e ku pê kîloyek şekirê nokan nake. Mele qeherî û di ber xwe de got, Xwedê cihê wî bike dojeh, min jî got qey niha tiştekî hêja ye û bû niçeniça wî lê dema mirîşk kirî û bangî melê kir da ku li ser mewlûdê bixwîne mele got: " Heyran ez gelekî nexweş im ez ê biçim nexweşxaneyê nikarim mewlûdê li ser mirîşkê bixwînim." Piştî ku mele nehat, Xelîlo pênc mirîşk ser jê kirin û dayika wî rabû mirîşk birin li cîranan belav kirin. Xwedê li ber destên miriyan bigerîne.

# 'Pêwîstiya gelê kurd bi ruhê Kobanê heye'

Navenda Nûçeyan

**Parlamenterê Tevgara Goran ê berê Dr. Şêrko Mihemed Emîn Qadir der barê geşedanên dawî yên di nav hêzên kurd de axivî û destnîşan kir ku çawa hemû hêz û aliyên kurd ji bo Kobanê bûn yek, hewce ye niha jî wisa tevbigerin**

PDK çend meh in bi alîkariya Tirkiyeyê ji Zînê Wertê heta Garê dixwaze dorpêç bike. Di çarçoveya vê dorpêçê de, hefteyek berê li Çemanka herêma Garê, hêzên Zerevan ên girêdayî serokwezîrê Herêma Federal a Kurdistanê Mesrûr Barzanî, xwestin li dijî kampên gerîlayên PKK'ê operasyon pêk bînin. Gerîlayên PKK'ê jî ji bo pêş li hêzên Zerevan bigirin du mayîn teqendin. Hat ragihandin ku ji ber teqînê pêşmergeyek jiyana xwe ji dest daye û du pêşmerge jî birîndar bûne.



Her wiha çend roj berî teqînê endamê Komîteya Rêveber a KCK'ê Mûrad Karayilan bang li Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî kiribû ku ew dorpêça herêmên hêzên wan lê qebûl nakin û xwestibû pirsgirêk bi diyalogê bê çareserkirin.

Piştî vê bangawaziyê, Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî li ser malpera PDK'ê ya fermî bersivek nivîskî da û bi tu awayî behsa diyalogê nekir. Barzanî di daxuyaniya xwe de wiha got: "Piştî êrîşên DAIŞ'ê, pêşmergeyên qerehmran ên Kurdistanê berê xwe dan eniyên şer ên terorîstan piraniya ew herêmên sînor vala kirin. Mixabin ji wê demê ve li şûna ku piştgiriya ezmûna Herêma Kurdistanê bikin, çekdarên PKK'ê van herêmên sînorî û paşê hinek herêmên din jî dagir kirin û xwe wek alternatîfa Hikûmeta Herêmê ferz kir. Ev yek pêşî li wê girt ku xelk mal û gundên xwe ava bikin. Dema welatî xwestin serdana herêmên xwe bikin jî bac ji wan girtin. Bêguman ev refterane nayên qebûlkirin. Helwesta niştimanperwerane û welatperwerane bi pratîkî tê kirin, ne bi gotin û daxuyaniyan."

Gel, partî û saziyên kurdan bertek nîşan dan wê daxuyaniyê dan û ew rexne kirin. Li gel hemû nerazîbûn û bertekan hêzên çekdar ên PDK'ê hêzeke xwe ya çekdar li herêmeke navbera navçeya Ranya û Rewanduzê bi cih kir û dest bi avakirina baregehên leşkerî kirin.

Têkildarê vê mijarê em bi parlamenterê Tevgera Goran ê berê Dr. Şêrko Mihemed Emîn Qadir re axivîn. Qadir got ku çawa ji bo Kobanê hemû kurd bûn yek, hewce ye niha jî wisa tevbigerin.

**'Parlamento lawaz e'**

Qadir ê di parlamentoya Başûr de 5 sal parlementerî kiriye, bal kişand ser helwesta parlementoya Başûr û wiha got: "Aliyên siyasî yên Kurdistanê, bi taybetî ew partî û derdorên siyasî yên di hikûmeta Başûr de beşdarên PDK, Goran û YNK'ê ne, hem helwesta wan lawaz e, hem jî li hemberî binpêkirinên li ser sînor bi hikûmetê re xwedî helwestekê nîn in. Nêzîkatiya PDK'ê ew e ku xwe di ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê re dibîne. Helwesta wê ya giştî ya li hemberî beşên din ên Kurdistanê jî gelek qels e."

**Rola Mam Celal**

Qadir daxuyaniya Mesûd Barzanî jî rexne kir û diyar kir ku hewce ye Mesûd Barzanî bi rola Mam Celal rabûya û wiha domand: "Bi taybetî jî axaftina Mesûd Barzanî ya têkildarî geşedanên li herêmê helwesta şer e. Di wê axaftinê de diyar e ku Barzanî alîgirê şer e. Arîşeyên heyî bi rêya diyalog û aştiyê çareser bibin. Heke Barzanî bi rastî jî xwedî mebestek bûya, diviya bû hinek li rabûrdiyê binihêrta û bi rola Mam Celal ku ruhê wî şad be rabûbûya. Li berevajî vê helwestê tevdigere."

**'Xewnên dagirkeran pêk neynin'**

Di axaftina xwe de Qadir bal kişand ser planên dagirkeran ên li ser çar perçeyên Kurdistanê û ev tişt anî ziman: "Hewce ye Barzanî planên dagirkeran -bi taybetî jî planên Tirkiyeyê - û xewnên dewletên dagirker ên li ser Kurdistanê bibine û bangawaziya şer neke û aliyê diyalogê bi pêş bixe. Li dijî vê aloziyê her çi derdorên civakî, siyasî, rêxistin û her jî çi rewşenbîr, çapemenî raya giştî ya gel heke xwedî helwest bin dikarin rê li ber vî şerî bigirin."

**Ruhê Kobanê**

Parlamenterê berê Qadir, di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser yekbûna hêzên siyasî yên di 2014'an de ji bo Kobanê hatibûn gel hev û wiha got: "Heke Kobanê di sala 2014'an de bûbe sembola têkoşîn û yekitiya kurdan, ev bi saya wê bû ku hemû hêzên siyasî yek bûn û pêşmerge û gerîla bi hev re şer kirin û DAIŞ'ê têk birin. Lewre piştrast bû ku ew wêneyê li Kobanê derket holê, sembola yekitiyê ye û wî wêneyî nîşanî hemû cîhanê da bê ka doza siyasî ya kurdan çiqas rewa ye. Bi wî wêneyî re doza kurdan li cîhanê belav bû, piştgirî jê re hat dayîn. Lewre jî ew wêne û ruhê neteweyî yê Kobanê girîng e."

# Banga diyalog û çareseriyê kirin

Navenda Nûçeyan

Piştî daxuyaniya Mesûd Barzanî, gelek partî, siyasetmedar û alî bi daxuyaniyan bertek nîşan dan.

Siyasetmedar Mihemed Emîn Pêncwênî têkildarî polîtîkayên PDK'ê û metirsiya rûdana şerê navxweyî yê kurdan axivî. Pêncwênî da zanîn ku piştî dewleta tirk li Rojava çend cihên stratejîk dagir kirin, li Başûr jî bi kûrahiya nêzî 60 kîlometreyî û dirêjiya 200 kîlometreyî bi pêş de hatiye û wiha got: "Ev nexşeya niha ya AKP û MHP'ê ye ku çawa dixwazin xwe nêzî bîrên neftê yên Kerkûkê bikin. Bi rêya tirkmenên li Kerkûkê dê Kerkûkê bikin a tirkan. Ev mijar tu peywendiya xwe bi şerê PKK'ê re tune ye."





Pêncwênî da zanîn ku erkeke niştimanî û neteweyî ya hemû aliyên siyasî ye ku hewil bidin vî şerî rawestînin û ev tişt got: "Divê her alî ji aliyê xwe ve hewl bide pêşî li derketina vî şerî bigire. Ji ber ku ev şerê dê tenê di berjewendiya dagirkerên Kurdistanê de be, ev şer ne di berjewendiya kurdan de ye."

**Li dijî şerê birakujiyê înîsiyatîf**

Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê jî bi daxuyaniyekê ragihand ku wê li dijî hewldanên şerê di nav kurdan de, înîsiyatîfek ava kiriye. Yekitiyê diyar kir ku înîsiyatîf dê ji bo pêşî li şerê navxweyî bigire, xebatên xwe bike.

Yekitiyê di daxuyaniyê de banga çareseriyê kir û wiha got: "Em dixwazin berpirs bikevin tevgerê û pêşiya tundî û şerê navxweyî bigirin. Em dikarin hemû bi hev re di bin heman sîwanê de bibin yek û pirsgirêkan çareser bikin. Em bi hêviyeke mezin gavên vê înîsiyatîfê davêjin. Ji ber ku em vê di asta berjewendiyên neteweyî û welat de dibînin. Em naxwazin ciwanên kurd xwîna kurdan birijînin. Divê birînên berê bi xwîn nebin û dijmin kêfxweş nebin."

**Parastina destkeftiyan**

Parlamentoya başûrê Kurdistanê bi navê Desteya Înîsiyatîfa Konferansa Niştimanî der barê rageşiya di navbera hêzên kurd de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ji her du aliyên kurd re hat gotin ku divê pirsgirêk bi rêya diyalogan were çareserkirin û bêyî diyalogê dê tenê dijmin wê sûd ji şerê navxweyî werbigirin.

Di berdewama daxuyaniya Înîsiyatîfa Niştimanî de ev tişt hat gotin: "Piştî ezmûna Herêma Kurdistanê, li Rojava jî ezmûn û destkeftek ji bo kurdan çêbû. Ev ezmûn ne di xewn û xeyala tu hizbek siyasî û serkirdeyek de bû. Gelê me li her çar parçeyan li benda dilsoziyek hîn zêdetir a hizban û rewşenbîran e; da ku hîn zêdetir hewl bê dayîn destkeftên zêdetir werin bidestxistin lê mixabin niha hewildan û pêngavên berovajiyê daxwazên şehîdan hene. Qala derketina şerekî bixwîn ê nav kurdan tê kirin. Ger ev şer derkeve ne tenê wê destkeftî ji dest herin, di heman demê de wê metirsî bikeve ser giyanê welatiyan û welatê me."

**'Rêzê li îradeya aştiyane bigirin'**

Seroka Parlamentoya Herêma Federal a Başûrê Kurdistanê Rêwaz Fayeq jî têkildarî rageşiya di navbera hêzên kurd de li ser malpera fermî ya parlamentoyê daxuyanî da û diyar kir ku pêwîst e her kes berjewendiyên neteweyî bide pêş.



Fayeq bal kişand ser rol û rista parlamentoyê û diyar kir ku parlamento nûnera rasteqîn a xelkê Kurdistanê ye, li dijî her cure şerê navxweyî ye û vê yekê weke tawanekê li dijî nirxên bilind ên gel dibîne.

Seroka parlamentoya herêmê da zanîn ku yekane rêya çareserkirina pirsgirêkan diyalog e û wiha got: "Pêwîst e her kes berjewendiyên neteweyî bide pêşiya her tiştî, xwe ji armancên teng ên partîgeriyê dûr bixe."

Fayeq di dawiyê de vê bangê kir: "Ez di vê qonaxa hestiyar de bang li her kesî dikim, aqilê aştiyane, bijardeya siyasî serdest bikin û berjewendiyên bilind ên gelê Kurdistanê li ber çavan bigirin."

**Partiyên Tifaqa Kurdistanî**

Partiyên Tifaqa Kurdistanî yên bakurê Kurdistanê jî têkildarî rageşiya di navbera hêzên kurd de daxuyanî da û diyar kir ku roj roja yekitiya neteweyî û parastina destkeftiyan e.

Partiyên Tifaqa Kurdistanî di daxuyaniyê de bal kişandin ser bedelên ku bi sedan salan e gelê kurd dane lê belê bi pêvajoyê bi vî rengî deskeftiyên kurdan bi planên dagirkeriyê tên tunekirin û wiha hat gotin: "Gelê kurd, bi sed salan e li ser erdnîgariya xwe bi dehan caran bi qetlîam û koçberiyan re rû bi rû maye; bedelên gelek giran dane û tevî van bedelên giran jî dev ji têkoşîna xwe ya neteweyî bernedaye. Ji bo Başûr serxwebûna xwe û Rojava jî statuyek fermî bi dest bixe têkoşîna xwe didomîne. Di pêvajoya têkoşîna azadî û sexwebûnê de, em bi xemgînî û bi şik dibînin ku hinek welatên dagirker, bi hewldanên provakatîf nakokiyên navbera partiyên kurdan kûrtir dikin û dixwazin li gor berjewendiyên xwe bi kar bînin."

**'Ev şer ne ji bo başiya kurdan e!'**

Tifaqê di berdewama daxuyaniyê de partiyên kurd jî hişyar kirin ku di warê mudaxeleyên provakatîf de baldar bin û berpirsiyariyên xwe yên dîrokî û rêbaza parastina berjewendiyên neteweyî de dikaribin li gel hev tevbigerin û wiha domand: "Banga me ew e ku rê li ber pevçûnek nav kurdan bê girtin. Lewra şerê di navbera kurdan de, duh jî ne li gor berjewendiyên kurdan bû û îro jî dê ne li gor berjewendiyên kurdan be, tenê wê bi kêrî dagirkeran bê."

**'Roj roja yekitiyê ye'**

Di dawiya daxuyaniya Partiyên Tifaqa Kurdistanî de hat diyarkirin ku rêya çareserkirina nakokiyên di navbera kurdan de diyalog e û wiha hat gotin: "Di serî de Rêveberiya Herêma Kurdistanê ji bo partiyên kurdan mecbûriyet e ku destkeftiyên kurdan li ku derê bin bila bibin hewl bidin wan biparêzin. Roj roja yekitiya neteweyî û parastina destkeftiyan e. Rêya çareserkirina nakokiyên di navbera kurdan de diyalog e. Ji ber vê yekê em bang li aliyan dikin ku diyalogê wek rêya çareserî bibinin û pirsgirêkan çareser bikin."

# Hilbijartina serokatiya DYA'yê

Hilbijartina serokatiya DYA'yê ya 59'emîn di 3'yê mijdarê de dest pê kir. Hilbijêr niha lijneya bijêran hildibijêrin, lijne jî wê di 19'ê kanûna 2020'an de serok û cîgirê DYA'yê hilbijêrin. Hilbijartina DYA'yê ji 2 merheleyan pêk te û ji ber vê pergalê jî dibe ku kesên herî zêde deng digirin neyên hilbijartin. Lijneya bijêran ji 538 delegeyan pêk te û ji bo serketinê herî kêm 270 delege hewce ye.

Hilbijartin ne tenê di rojeva DYA'yê de ye, hemû cîhan niha hilbijartinê dişopîne. Ji 3'ê mehê heta niha ji Partiya Demokrat Joe Biden li pêş xuya bike jî wek 4 sal berê îxtimala serketina Donal Trumpê jî heye.

Ji ber pandemiyê hejmara kesên bi postayê deng dan zêde bû û ji ber vê yekê jî dibe ku hilbijartin li gorî hilbijartinên berê zêdetir wext bigire.

Tevî ku hêj jimartina dengan dewam dikir Donald Trump serkeftina xwe ragihand û tîma Biden jî axaftina Trump wek skandal pênase kir.

Dema ev nûçe dihat amadekirin encamên eyaletên Pennsylvanîa, Georgîa, Arîzona û Nevadê hê ne diyar bûn. Her hiwa li ser îtiraza Trump li eyaleta Georgîayê deng ji nû ve dihatin hilbijartin. Ji bo serokatiyê 270 delege hewce ne û Biden 264, Trump 214 delege bi dest xistibûn. Nîqaşên li ser hilbijartinê hê jî didomin.




# Fîsk jiyana xwe ji dest da


Nivîskar û rojnamegerê îngilîz Robert Fîsk (1946) di 74 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. Fîsk wek rojnamegerê Rojhilata Navîn dihat nasîn.

Fîskê ku nûçegihanê pispor ê rojnameya The Independentê bû, zêdetirî 30 salan bi taybetî li ser mijarên wek Beyrût, şerê di navbera Amerîka- Afganistanê de, dagirkirina Iraqê ya 2003'an û gelek şer û şoreşên li Rojhilata Navîn pêk hatin lêkolîn kirin û ew li cih dişopandin. Der barê van mijaran de jî gelek pirtûk nivîsîne.

Robert Fîsk ê buyerên li Çelêya Colemêrgê xistin nûçe, di 2 gulana 1991'î de bi fermana Hayrî Kozakçioglu hat binçavkirin û dersînorkirin.

Fîsk ê gelek xelat wergirtine, gelek nivîsên ku Amerîka û Îngilistanê bi awayekî tund rexne dikin, ji bo dagirkirina Iraqê nivîsandibûn.

Rojnameger Fîsk ji bo ku operasyona dewleta tirk û hevkarê wê OSO'yê( Artêşa Suriyeya Azad) bişopîne hatibû Efrînê û çavdêrî û lêkolînên xwe yên der barê şer de weşandibûn. *LONDON*





Destar

Ehmed Pelda

# Zibare ango subsîstence economy

Di termînolojiya aboriyê de gotina "subsîstence economy" xwedî cîhekî hêja ye. Li gor zimanê me wek aboriya edetî, kevneşopî, ya zemanê berê an jî ya kalubavan tê bilêvkirin. Hîmê wê li ser debarê hatiye rûniştandin. Wexta zemanê berê civata ku bi riya nêçîrvaniyê, sewalvaniyê an jî çandiniyê debara xwe dikir, tenê dikaribû pêwîstiyên xwe yên bingehîn peyda bikirana.

Ev çi bûn?

Peydakirina xwarin, lixwekirin, xwedîkirina derfetan ji bo şêniyên malê û pêlazimiyên sewalên malê bûn. Dîsa xwecihkirin û ji ber vê avakirina xanî ji bo civata malê û çêkirina tewle û goman ango nivgeha heywanan beşeke ji karûbarên şêniyên malê yên girîng bû.

Bi rastî der barê vê mijara aboriyê de, lîteratureke têrûtije heye. Li gor min bi kurdî mijara zibareyê beramberî subsîstence economyê ye. Ji ber ku kakilê vî karî hevkarî ye. Pere nîne, navgîn kêm in û ne pêkan e ku kesek tenê bibe xwediyê hemû ked, hêz û navgînên hilberînê. Heke serdestek be û xwediyê navgînan be jî dîsa hewceyî xebatkaran e û ji ber bedela wê jî tenê dikare berhem bide, da ku zemanê berê pere û pulê îroyîn yê pergala kapîtalîzmê li ser piya digire nîn e.

Taybetiyeke din jî ew e ku wekhevî nîn e lê karbeşî reng û rîçalê vê pergalê ye. Wekî mînak hin kes xwedî zevî ne, hin kes xwedî tov in, an jî xwediyê ga û hespan in lê yên mayî jî tenê xwedan hêz in û dikarin bi hêza destan bixebitin; hin ên din jî hoste yan jî rêncber in. Belê ev kes civatekê pêk tînin, biryar didin ku zeviyê rakin, tov bireşînin û berhema wê jî bigirin. Lewma rêncber kar dike, hoste navgînan çêdike yan jî kêmasiyên heyî saz dike. Bi vî awayî herkes destekariyê dide hev lê ne pêkan e ku berhema zeviyê wekhev bê parvekirin.

Çima ev weha ye?

Wekî mînak cotkar tenê bendeyê wê zeviyê namîne û diçe li hin cihên din jî dixebite. Hoste tenê bi karê navgînên zeviyekê nastirê û di ber re hin karûbarên din jî dike. Xwediyê zeviyê piştî çandinê dîsa cureyekî din ê şixulê jî dimeşîne. Lewma, em dikarin bibêjin ku destekarî û beramberiya şixulê heye lê her tişt tenê bi wê ve girêdayî nîn e. Lewma bidestxistina berhem, qezenc û dahatiya kesan li gor plan, hesap, xebat û têkiliyên wan cuda ne.

Ev cure aborî li gelek deverên cîhanê heye. Hê li Afrîkayê, Amerîkaya Latîn, li deverên Asyayê û li Kurdistanê nîşanên wê berdewam in. Nêçîrvaniya masiyan ya Gronlanda warê berfê, komkirina nebatan a kom û bereyên li Amazonan, sewalvanî û rêncberiya eşîrên civatên gundewarên Afrîkayê çend nimûneyên zindî ne. Dîroka wê, ji kapîtalîzm ango pergala sermayedariyê jî ji şoreşa çandiniyê jî dirêjtir e. Wekî tê zanîn dîroka kapîtalîzmê ji 300 salî zêdetir nîn e, ya şoreşa çandiniyê jî ji 7 hezar salan wêdetir nîn e lê dîroka mîrovên hilberîner ên karûbarên sîstematîk kirine xwedî dîrokek 100 hezaran salan zêdetir e ku sewalvanî, komkirina pincar û şênkayiyê û şixulandina navgînan destnîşanên berbiçav in.


Ev pergal di jiyana modern de jî berdewam e. Muhammed Yunus ku aborîzanekî pakistanî ye, pergala mîkro credîtê ji cureyê aboriya civaka Pakistanê giritibû ku nêzî ya Kurdistanê ye jî. Li gor vê çawa berê gel destekarî dida hev, navgînên xwe parve dikirin, îro dewlet jî dikare beramberî bedela navgîn û amûran, destekariya pere bide. Kesê ku bê derfet be, wê bi saya serê vê rêbazê, bikare çandiniyê li ser zeviya xwe bike yan jî çend çêlekan xwedî bike û ji şîr û penêrê wê feydê bibîne. Golikan jî ji ber bigire û hejmara wan zêde bike. Ev pergal li Ewropa, Amerîka, Tirkiyeyê jî hat ceribandin, di qadên aboriyê de berfireh bû. Jixwe mînakên serkeftî jî hene ku bi dewlemendî berdewam in.

Ji hêla cureyên karûbarên zibareyê ve Kurdistan cihêreng û zengîn e. Zibare bi serê xwe beşek e. Col, şikatî, novane, cirîg, dor, palute, pîgarî û şîrîgahî tenê çend çeşîd in. Ev karûxebatên dilop bi dilop di kêşa dîrokê re givirîne û dirûv girtine, em ê pêyderpey wek mijar bi we re parve bikin lê vê bêjim ku hinek li ser hîmê hiqûqî, sinc û ehlaq rûniştine, hinek cure jî li ser hesabên parvekirina navgîn, berhem, ked û zeman bi riya matematîkê hatine sazkirin. Hinek ji van celeban veguherîne ser aboriya modern û bûne mînak. Wekî em dikarin pergala col ruberî şîrketa kolektîf bikin û wek nîşana koka wê destnîşan bikin.

Em vegerin mijareke din. Hê jî gelek civaknas û aborînasan, ev rewş raçav nekirin û der barê vê mijarê de tiştekî balkêş nenivîsîne. Tenê bi gotina feodal, têkiliyên hilberînê an jî pergala îmeceyê bi nav kirine û di ser re derbas bûne. Îsmaîl Beşîkçî ku ewqas salên xwe li Kurdistanê derbas kirin lê çawa ev rewş nedît, balkêş e? Dibe ku kurdî hîn nebû û lewma ev tê dernexist. Martîn van Bruînessen kurdî hînbûbû û bal kişandiye ser cureyên aboriyê jî lê her car xwestiye rûberî pergala aborî ya Ewropayê bike û vê jî ew korezanî kiriye ku nekariye giliya mijarê vereşîne. Kurd siyasetmedar û aborîzan Abdurrahman Qasimlo jî ji meselê dûr maye lê mixabin ji ber ku dîtina marksîstî ji xwe re kiriye rêber hemû bala xwe daye têkiliya serdest û bindestan, bandora wan a aborî û di encamê de hejarî û belengaziya civakê.

Lê belê berevajiyê van Mele Mehmudê Bazîdî bêhtir agahiyan dide. Lewma, ji bo civaknas û aborînasan jî hêjayî xwendinê û analîzê ye.

Bi qasî ku ez xwendina cureyên zibareyê ya aborîya cîhanê dikim, hêviya min ya ji bo aboriyên alternatîf zêdetir dibe. Tecrûbeya mirovahiyê ya aborî û civakî ji kapîtalîzma îroyîn xurttir, hêjatir û ji hemûyan wêdetir jî ji bo têkiliya mirov bi mirov, mirov û xweza, mirov û navgînan, mirov û heywanan qenctir e.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Gel dikare pêşî li şer bigire

Li herêma başûrê Kurdistanê geşedanên siyasî û leşkerî êdî hatine radeyeke pir xeternak. Tevî hemû hewildanên partî û aliyên siyasî yên li Başûr û çar perçeyên Kurdistanê PDK di ya xwe de israr dike.

Bi taybetî piştî derketina DAIŞ'ê û êrîşên 2014'an, PDK ji xeta neteweyî dûr ket û bi temamî ket bin kontrola dewleta tirk. Niha li herêmê li şûna rayedarên PDK'ê endamên MÎT'a tirk biryarê digirin û li gor wê jî PDK tevdigere.

Ji ber hewildanên PDK'ê her diçe rewş xeternaktir dibe. Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Mûrad Karayilan bang li Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî kir û jê xwest li hemberî vê rewşa heyî têkeve dewrê lê Barzanî li şûna avê li agir bike, agir gur kir.

Barzanî di daxuyaniya xwe de PKK'ê bi dagirkeriya xaka Herêma Kurdistanê sûcdar dike lê di şerê li dijî DAIŞ'ê de ji bo parastina Herêma Kurdistanê PKK'ê rolek diyarker lîst. PKK ev nêzî 40 sal in li herêma Behdînanê heye. Li vê herêmê xwedî ezmûneke xurt û mezin e. Di nav van salên dûr û dirêj de bi gelê herêmê re tekiliyeke xurt ava kiriye. Lewma şêniyên herêmê tu carî ji hebûna PKK'ê aciz û nexweş nebûne. Bêguman rayedarên PDK'ê vê yekê baş dizanin. Lewma di vî şerê neheq û bêwate de nikare ji xwe re hevalbendan peyda bike. Di vî şerî de yekane hevkarê PDK'ê dewleta tirk e.

Li gorî agahiyên fermî yên hikûmeta Herêma Kurdistanê Tirkiye 40 kîlometreyan ket nav axa Herêma Kurdistanê. Erdogan jî dibêje; "Me li ku derê xwîna xwe rijandibe, ew der axa me ye." Piştî vê daxuyaniyê ev pirs tên kirin, gelo wê rayedarên Herêma Kurdistanê bersiva Erdogan bidin an na? An jî sedema hebûna baregehên artêşa tirk ên li herêma Kurdistanê ji ber vê nayên valakirin?

Ji sala 1990'an û vir ve Tirkiye li başûrê Kurdistanê baregehan ava dike û bi cih bûye. Li gorî çavkaniyên Tirkiyeyê û çavkaniyên fermî yên Herêma Kurdistanê heta niha ji 40'î zêdetir baregeh û navendên Tirkiyeyê li ser axa başûrê Kurdistanê hene. Her wiha li gorî agahiyên Lijneya Parlamentoya Herêma Kurdistanê artêşa tirk bi kûrahiya 40 kîlometreyan bi dirêjiya 200 kîlometreyan axa başûrê Kurdistanê dagir kiriye. Ji vê demê ve bi sedan welatiyên Herêma Kurdistanê şehîd û birîndar bûne lê rayedarên PDK'ê li himberî vê dagirkeriyê bêdeng û bêhelwest in.

Li ser vê mijarê çend pirs tên hişê mirov. Dema DAIŞ'ê êrîşî herêma başûrê Kirdistanê kir PDK û Barzanî ji PKK'ê alîkarî xwest. Di navbera PKK'a 2014'an de û PKK'a niha de çi cudahî heye? Di rojên teng de xwe bavêje bextê PKK'ê û dema rewş aram bû û şûn ve bi hevkarên xwe ve êrîşkirin dikeve kîjan exlaqî?

Ev hevkariya PDK'ê û dewleta tirk di rojên wisa de hîn pirtir derketiye pêş û ger pêşî lê neyê girtin wê gelê kurd gelek destkeftiyên xwe ji dest bide. Ji bo gelê kurd destkeftiyên xwe ji dest nede û bikaribe pêşî li vê xiyaneta mezin bigire pêwîstî bi ruhekî neteweyî heye. Ev ruh û helwesta neteweyî dikare PDK'ê bi temamî bikişîne ser xeta rast û kurdistanî.

Lewma di serî de gelê başûrê Kurdistanê û her çar perçeyên welat pêwîst e gel dakeve qadan û ji partiyên siyasî daxwaza yekitiyê bike da ku bikaribin pêşî li vê xiyanetê bigirin. Di halê heyî de pêşveçûnên li herêmê diqewimin, bi çend nirxandinên baş û şîretên êrênî nayên sekinandin. Ji ber ku hevkar bi temamî xwe ji hemû bang û nêrînan re girtiye!

Tevî van hemûyan jî berpirsên PKK'ê û KCK'ê banga aştiyê û diyalogê kirin û gotin, "Em şerê navxweyî naxwazin" lê li dijî vê yekê Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî daxuyanî da û li dijî PKK'ê peyama şer da.

Li hemberî vê daxuyaniya Barzanî ji çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat bertek hatin dayîn. Ev jî asta ruhê neteweyî ya gelê kurd nîşan dide. Ger ev bîr û baweriya gel hebe wê hevkar li ser axa Kurdistanê nikaribin xwîna kurdan birijînin.

Ji ber PDK naxwaze were ser xeta yekitiyê ku gel vê dixwaze û piştgirîdayîn di vê siyaseta pûç ya şer de ew bi tenê dimîne. PDK û rêvebiriya wê ger di vê şaşitiya de israr bikin, wê gelê kurd bersiva herî mezin bi helwest û îradeya xwe ya li dijî şerê kurd bi kurd nîşanî wan bide.

Çi dibe bila bibe pirsgirêk çiqas mezin be bila bibe, ne gengaz e ku bi riya diyalogê neyê çareser kirin. Berpirsên PKK'ê di her daxuyaniya xwe de îşaret bi diyalogê kirin û gotin: "Em amade ne ku meseleyê bi riya diyalogê çareser bikin."

Pêwîst e meseleyên Kurdistanê di nav hêz û partiyên Kurdistanê de bên çareserkirin. Ji bo vê yekê banga Mûrad Karayilan bi wate û girîn bû. Mixabin aliyên PDK'ê ne xwedî heman hestiyariyê ne.

# Ûsivê Mero: Serhildêrê serhildana Agiriyê



Sedat Ulugana

**Ûsivê Mero li zozanên Eledaxê di nav şer û pevçûnan de mezin dibe. Di ciwaniya xwe de, 6 leşkerên Osmanî yên ji bo berhevkirina bacê tên êla Bekiran, dikuje û dertê çiyê**


Li her bihust erdê Kurdistanê, xwîna lehengekî kurd (çi jin çi mêr) rijiyaye û dîrok vê yekê baş dizane. Bi hezaran jiyana xwe ji dest dane ku piraniya wan îro bêgor in û Kurdistanê ew kirine nav dil û cergên xwe yê germ. Hinek ji wan jî sax filitîne û bûne firarên dijminên xwe, çi li çiyayan çi li deştan.

Ûsivê Mero jî yek wan saxfilitiyan bû. Kengî û li ku ji dayik bûye ez nizanim lê di nasnameya romê de '1'ê Tîrmeha 1890'î Erdîş' dinivîse. Çawa ku di nasnameya "Cûmhûriyet"ê de piraniya kurdan li gor teqwîma mîladî di 1'ê çileyê (sersal) de dayik bûne, di qeydên Osmaniyan de jî kurd li gor teqwîma rûmî hemû di wê rojê de ji dayik bûne!

Ûsivê Mero li zozanên Eledaxê di nav şer û pevçûnan de mezin dibe. Di ciwaniya xwe de, 6 leşkerên Osmanî yên ji bo berhevkirina bacê tên êla Bekiran, dikuje û dertê çiyê. Çendek şûn de, nêzî behra Wanê, li gundê Arnêsê li mala pismamê Yaşar Kemal tê girtin (ev gund, gundê Yaşar Kemal e) wî digirin û ji bo îdamkirinê dişînin Taşxana (zindan) Erzeromê. Çawa ku malbat dibêje, Mihoyê apê wî qerekterê Romê baş dinase. Nîv tûr zêr hildide li pey wî diçe Erzeromê û van zêran li heyeta "axir cezayê" belav dike û çend roj şûn de Ûsiv tê berdan.

Di Şerê Cîhanê yê Yekem de, ji ber ku bavê wî - serekê eşîra Bekiran Merûf Axa- ji aliyê Qaznaxên Ûris ve tê kuştin. Ew bi sond û peyman li hemberî Ûris şer dike, heya dawiya şer li çiyayên geliyê Zîlan li ber xwe dide û welat terk nake. Piştî damezirandina komara tirkan, ew jî wek çendan kurdan bû dijminê kemalîstan û di sala 1926'an de bi tevahiya pismamên xwe Reşoyê Silo çû Gilîdaxê û tev li şoreşa Agiriyê bû. Çawa ku Feqî Huseyn Sagniç (apê Feqî) jî dibêje, hêla geliyê Zîlan di bin destê wî de bû. Di tîrmeha 1930'yan de bi tevahiya şervanên xwe tev li şerê dorpêçkirina Erdîşê dibe. Çawa tê gotin, di vî şerî de bi dehan balafir hatibûn bikaranîn û wî di vî şerî de bi pismamê xwe yê bi navê Hesê Keko ve sê teyare xistibûn xwarê. Her wiha Îhsan Nûrî jî di bîranînên xwe de behsa vî şerî dike û dibêje:

"Qehremaniya şervanên Bekiran bêhempa bû. Yên di destên wan de çek tune bûn, bi daran êrîşê balafirgeha Erdîşê kirin." Di dawiya vî şerî de Ûsiv ji lingê xwe birîndar dibe. Derbasî herêma Adilcewazê (Filistan) dibe û di navbera gundê Qerekeşîş û Axçirayê de di şikeftekê de bi mehan dimîne da ku kirîvê wî yê bi navê Mihemedê Qulîxan birîna wî derman dike lê piyê wî bi temamî baş nabe û ew qot dimîne.



# Ağrı haydutları

## İki asi kaçakçı öldürüldüler

**Erciş 26 — Ağrıdağ isyanından evvel mahpus iken hapisaneden firara muvaffak olan ve asilere iltihak eden Nebo ile dokuz arkadaşı Karaköse taraflarından yakalanmışlardır. Haydutlar muhafaza altında sevkedilirlerken Nebo ile idam mahkûmu Derviş kaçmağa teşebbüs etmişler, jandarmalar tarafından öldürülmüşlerdir. Geri kalan yedi âsi buraya getirilmişlerdir.**

Di sala 1931'ê de careke din derbasî geliyê Zîlan dibe û digihîje koma Bekiran ên di bin himeta Reşoyê Silo de ne. Kom di zivistana 1931'ê de çend caran dikeve kemînê. Her wiha dewlet bêtir li pey Ûsiv û Reşo ye. Di kemîna gundê Şarbazarê de, Eliyê Arif, Îbo û Bekirê Qulîxan tên girtin. Ji ber ku Elî û Îbo merivên (xizm) Ûsiv û Reşo ne, ew di zivistanê de tazî dikin û qeşaya li ser çemê geliyê Zîlan dişikînin û wan dixin nav avê lê her du jî cihê Ûsiv û Reşo nabêjin. Paşê her duyan li wir bi balteyan dikujin.

Ev Roma Reş e, defik û sêrbaziyên wê pir in. Birayekî Elî hebûye, navê wî Welî bûye, melayekî amil û tamil bûye. Haya wî ji tu tiştî tune bûye. Çendekê wî di camiyê dederînin û dîl digirin lê ew jî naaxive. Lewma serleşkerê mufrezeyê Atîlla Îbrahîm Karay bi demançeya xwe wî li hemberî şaredariya Erdîşê înfaz dike.

Çawa tê gotin, di sala 1932'yan de koma Ûsiv û Reşo êdî li geliyê Zîlan star nabe. Gundiyên ku ew xwedî dikirin rastî zilm û zelaleteke mezin dihatin. Rojekê li gundê Selexanê dikevin kemînê. Heya êvarê ew li ber xwe didin. Leşker dest bi rêbazên qirêj dikin. Zar û zêçên gund tazî dikin û li ser berfê didin rûniştandinê. Zarîniya zarokan diçe asîman. Keyayê gund Efendiyê Salo gazî dike û dibêje: "Hewar Ûsiv axa, Reşîd axa hewar! Ji bo Xwedê ji gund derbikevin herin, zar û zêçên me li ser berfê qir bûn." Ew roj Ûsiv bi koma xwe re bi tundî êrîşê mufrezeyê dike. Çawa tê gotin, Ûsiv gazî dike dibêje: "Ez firarê Romê me, qesasê serê teresê cendirma me."

Koma Ûsiv û Reşo di van rojên sar de bê erzaq dimînin. Çend hefteyan bi berfê û hineya li ser keviran debara xwe dikin. Ûsiv dinihêre ku êdî li herêmê gel nikare wan xwedî bike, ew mirovên xwe hildide û derbasî hêla Patnosê dibe. Reşo jî bi mirovên xwe û hevjîna xwe Zeyno re hewl dide ku derbasî Îranê bibe lê li şikefta Devetaşê dikeve kemîna leşkeran. Qumandan Atîlla Îbrahîm Karay serê Reşo û Zeyno jêdike û gund bi gund heya Erzeromê digerîne.

Koma Ûsiv jî li gundê Axiyê (Kocapinar) li mala "zeyiyeke Bekiran" tê girtin. Herî kêm 10 kes bûne. Birayê Ûsiv ê piçûk Kerem jî di nav wan de bûye. Leşker wan digirin dibin qereqola Dedeliyê. Ûsiv ji malbatê re dibêje: "Ew roj wan di goşeyekî qereqolê de hevalên min didan îşkencê. Digotin "ka bêje Ûsiv kî ji we ye?" Di goşeyekî de jî eskeran xaliya sobeyê kom kiribûn ku xwîna hevalên min dikişiya ser wê xaliyê lê yekî ji wan nedigot Ûsiv ev e. Gazî Neboyê Hemoyî kirin. Nebo jî navê min negot û zimanê Nebo bi mendîlê girtin ji devê wî derxistin û zimanê wî jêkirin. Paşê jî avêtin nav singûyan kuştin û gotin aha yek reviya me kuşt…" Belê ev îfadeya Ûsiv e.

Di van rojan de, heman bûyer di çapemeniya tirkan de jî derbas dibe. Di rojnameya Cûmhûriyetê de (28.01.932 - rûpela sêyem) xebereke kin derbas dibe: Heydûtên Agiriyê - Du serhildêrên firar hatin kuştin – Erdîş - 26, Nebo, yê hê berî serhildana Araratê girtîbû û ji girtîgehê reviyabû û tev li serhildêran bûbû û neh hevalên wî li hêla Qerekosê (Agirî) hatine girtin. Dema heydût ji bo radestkirinê hatin sewqkirin, Nebo û Dewrêş ê mehkûmê îdamê bûn, hewl dane ku birevin û ew ji aliyê cendirmeyan ve hatine kuştin. Yên mayî, heft serhildêr anîne vê derê.

Belê Ûsiv tînin Erdîşê. "Şewqeyeke Cûmhûryetê" (kasket) didin serê wî û bi birayê wî ve qereqol bi qereqol peyatî dibin Edeneyê. Di girtîgeha Edeneyê de nêzî hezar (1000) girtiyên doza Agiriyê hebûne û temamê wan jî ji ber qulêrekê (kolera) nexweş bûne. Di demeke kin de Kerem dimire lê Ûsiv dijî. Doza wî çend salan didome. Ji ber xistina balafirê pêşiyê hukmê îdamê didin wî û paşê hukum vedigerînin 12 salan. Ew 12 salan di girtîgehê de dimîne ku çawa behsê dike, di nav vî 12 salî de tenê du peyvên tirkî fêr dibe : "Ekmek" û "Su"… Ûsiv dema cezayê xwe diqedîne, êdî nahêlin ew vegere Kurdistanê. Wî dişînin Dîdîm Akbûkê. Akbûk gundekî rûman bû ku rûm şandibûn Yewnanistanê. Ûsiv li wir heya sala 1955'an dimîne. Xizan dibe û nexweş dikeve. Dema qanûna Sirgûniyê ji holê radibe, ew vedigere welêt, nav meriv û eşîra xwe lê kes wî nas nake. Ji ber ku di navberê de zemanekî dirêj derbas bûye, eşîratî jî êdî wek berê nîne. Demokrat Partiyê axayên nû afirandine. Ûsiv çend salan hewl dide ku li Kurdistanê bijî lê nabe. Careke din vedigere Akbûkê û li wir diçe ber dilowaniya xwe.

Wî li pey xwe jiyaneke birûmet û çîrokên lehengiyê hiştin. Her çiqas rojnameya Cûmhûriyetê wî wek "Heydût" bibîne jî ew kurdekî endamê Xoybûnê bû û li xwebûna xwe xwedî derketibû. Belê rast e, "eşqiyayên hin dewletan ji bo hin gelan qehreman in."

# Gava ez bûm miftî



Seyidxan Anter

Havîna sala 1973'yan, bi selika tije fêkî û hin tiştên ruhin di nav de veşartî, min serdana girtiyên polîtîk ên li hepsa vekirî ya Amedê kir. Ev zindan dê bûbûya muze ku hîn jî temam nebûye. Li başûrê vê muzeyê li binê bedenê jî mizgefta "Silêman Pêxember" heye. Rojek ji rojên payîza paşîn, roja êvara înê, bi mamosteyê xwe Amed Tîgrîs re, me da rê ku em bizanibin muze qediyaye an na.

Ji deriyê Serayê heta bi devê deriyê "muzeya nû" û bedena li çemê Tîgrîsê (Dicle) dinêre, tîcaret, wahiz, qesîde, pars, xwendina hedîs û quranê... dê weledê xwe davêt. Jinek pîr li me nêzîk bû. Wa xuya bû duha dixwend lê min jê fêm nedikir. Amed Tîgrîs ê zû dihizire got: "Binêre ev miftî ye ha!" Ji ber treçkotê min ê dirêj û gewr ve, pîrê ji Amed Tîgrîs bawer kir û ji min tika kir ku îca ez ji wê re duhayan bikim. Dema me nêzîkayî li muzeyê kir, wê carê Amed Tîgrîs ji xortê yasîn dixwend re got: "Binêre ev muftî ye, tu xweşik bixwînî ha!" Hindik mabû xort dest û dawa treçkotê min ramûse.

Li ser texrîbatên artêşa ereban a serdema Xelîfe Omer, agahiyên berfireh di pirtûka Amed Tîgrîs de ya li ser Amedê hûn dikarin bixwînin. Wek mînak, kengî û çawa Îlyas bin Ganem dêra Mor Toma kiriye mizgeft û çi mêrê ku nebe misilman çar misqal zêr bêş davête ser wan.

Di sala 639'an de, çaxa artêşa ereban êrîşî Amedê dike, di vî şerî de Silêman tê kuştin. Li jêra muzeyê li ber bedenê, ji Silêman re gorekê dikolin û dûra jî mizgeftek bi navê wî lê dikin. Wa diyar e ku merîfetên wek ku bi tirkî nav li wî kirine "H.z Silêman" gelek in. Delalên ku ji bo firotina malên xwe bang dikin, dengê duha, gotinên wehza, xwendina ji pirtûkan, zûrezûra nesaxan, awaza parsekan, giriyên zarokan û gelek awazên din bi hev re û li hev vedigeriyan. Pêşbirkek saz kiribûn bê ka kî bêhtir dikare dengê xwe bibe serlêderan û belkî bigihînin Silêman jî!

Xaleke zelal û diyar e. Her çiqas seyda, miftî û şêx dibêjin bi dû Muhamed re çi pêxember nayên jî Silêmanê kurê Xalid bin Welîd li Amedê bûye "Silêman Pêxember".



Gava em berê xwe bidin rojavayê Kurdistanê, bûyer û dîrok xumamî û tevlihevtir dibe. Li bakurê Girkê Legê (ku Al- Cumhuriye al- Arabiye al- Suriye navê vî warê petrola kurdan, daniye Rimêlan), li gundê Qilêrîkê yê kendala çemê Baus ê li başûrê rojhilatê Dêrika Hemko, li ser tixûbê Deşta Hesina, qubeyek ziyaretê ava kirine. Li gor çîrokê gava Xelîfe Elî hatiye rojavayê Kurdistanê, li Bausê destmêj girtiye û bo ku bêhna xwe ber de jî li peravê çemê Bausê qubeyekê ji xelîfê îslamê re lê dikin. Her wiha Alî bin Abî Talib li Kurdistanê li gundê mesîhiyan Bausê dibê Eliyê Şêr. Dîroknas û lêkolîner dizanin ku Xelîfe Elî ji Şamê berjortir nehatiye. Îro li rojavayê Kurdistanê, li dor û berê wê qubêgoristanek çêkirine. Goristana Cangoriyan ku xelk lê diçin serlêdana gorên xizm, dost û hogirên xwe.

Li gelek cihên welatê me, mirov dikare li bûyer û serpêhatiyên bi vî rengî rast were. Hinekan em dizanin, hinekan em nizanin û di derheqê hinan de jî em rast nehatine agadarkirin. We got çi?

# Zazakî: Qanala hîreyini

Estareyo Aliqnaye

**A-Destpêkî ser**

Eya, ma pêro rewşa zazakî ra xeberdarî. Rîyê ino ra ez tespîtanê qlîşeyan nêkena ke şima eciz nêbî. Nîyetê mi o yo ke merdima/o ke ino nuşte wend, rewşa zazakî û sebebê ina rewş de newera bifikirîyê. Ez zana, babeta ke ez ser nusena zaf bitahlukeya û beno ke dormare ra zaf rexne bêrî. Wîna zî dahîna weş beno.

Raşte raşt ina rewşa zazakî ser bandora tirkî zaf a. Ina bandor ser gelek merdimî kitab nuştî, meqaleyî nuştî. Ez nika behsê zazakî ser bandora tirkî nêkena. Behsê bandora kurmancî û kurmancan kena. Tena ino zî ney, behsê vera bandora kurmancî de tawirê zazayan zî kena, hemt û halê xo de.

Sey mi zafê merdimî, wexto ke teraqa "Zazakî ziwana yan lehçeya?" beno wîna cewab danî: Ziwanê kurdî sey yew keyeyo û ino keye de panc heb birayî estî: Kurmancî, soranî, goranî, zazakî û lorî. Eya, ez zî wîna fikirîyena labelê ez ino zî qayila bibersa, "Gelo biratîye lehçeyanê ziwanî kurdî, nêmana biratîya gelan yê Tirkîye? "Biratîye, nîno mehnaya seyyewbineyî. Semedê ino ra çîyo ke mûhîm o bîratîye nîya, seyyewbineyî ya. Peynî peyen, birayo şenik û birayo pîl mûmkûn o ke yew bibî? Wîna aseno ke zazakî "birayo şenik" hesibîyeno hetê qalkerdoxanî lehçeyanî bînan ra. Tena hetê înan ra zî ney, zafê hunermend, nuştox, wendox û xebatkarê zazakî zî ina rewşe qebul kerda. Labelê ziwanan mîyane de têkilîya ke virazîyena, qet sey têkilîya birayo şenik û birayo pîl nêbena. Mûmkûn nîyo zî biba. Labelê Bakurê Kurdistan de, xusussen hetê kurmancan û gelek karkarê zazayan ra zazakî sey birayo şenik yena veynayiş. Ez senî wayirê ino fikir bîya, bêrî ma numuneyan ra biewnî:

**B- Kurmancan ra çand numûneyî**

**1)"Şima pêro xeyr ameyî!"**

Ez çand ray Kurdistan de şîya konferans, panel, konser ûsn. ê kurdan. Ez Tirkîya de zî şîya. Ma vacî Îstanbul de. Inê kombîyayişî wexto ke bajaranê Tirkîya de benî, semedo ke temaşekarî fehm bikerî, di heb merdimî program danî şinasnayiş. Yew tirkî program dano şinasnayiş, yew zî kurmancî. Merdim ino hal normal veyneno. Çimkî mûmkûn o ke bajaranê Tirkîya de her kes ziwanî kombîyayişî nêzano. Labelê wexto ke ino tewir kombîyayişî bajaranê Kurdistan de benî tene yew merdim sahne de beno û eke şansê zazayan bibo îhtîmalo ke bi vaco, "Şima pêro xeyr ameyî!". Bajaranê Kurdistan ra zî qestê mi sey Colemerg, Wan yahût Şirnex nîyo ke tede zaza çinê bo. Ina rewş Amed de zî wîna ya. Amed ke hema hema hîrê ra yewê ci vîşêr zazakî qal keno.

**2)Kurdkî = Kurmanckî**

Eke şima biewnî şima veynenî ke, xususen qapaxê kitabî rastnuştişî yahût ferhengê ke hetê kurmancan ra û kurmancî nusîyayî zafanê wîna nusîyeno: Kurdî-Tirkî, Kurdî-Farisî, Kurdî-Fransizî, Ferhanga Kurdî, Kûrtçe-Tûrkçe ûsn.

Labelê inê pêro kitabî kurmancî îhtîva kenî. Tene kitaban de ney, hema hema her babet de xeletîya kurdî=kurmancî bi îstîqrar şuxulîyena. Ma vacî programêk yeno viraştiş hetê kurdan ra û ziwanê ci tene kurmancî yo. Labelê ti ewnîyenî ke afîş û posterê ci de wîna nuseno: Progra min dîlî tûrkçe ve kûrtçe dîr.

Vera ino hal de heqê ma esto ke ma bipersî, eke zazakî zî lehçeya kurdkî ya, senî kurdkî tene kurmancî ra îbaret bena? Wîna têwgeyrayişî de senî yew psîkolojî esto? Kurmancî lehçeya xo, sey birayo pîl veynenî yan nêveynenî?

Ina babet ser sewbina çîyo ke sey dejavu yeno çimanê ma ver ino yo: Kurmancî, senî bi îstîqrar lehçeya xo û çekuya kurdkî yew tewişenî, zazayî zî bi îstîqrar her ca de ina ra perrenî. Yanî eke şima pêro ferheng û kitabê rastnuştişî zazakî ra biewnî, şima veynenî ke qapaxê inê kitaban de çekuyê ke şuxulîyenî inê yî: Kirmanckî, zazakî, dimilkî, kirdkî. Inê kitaban ser caran kurdkî nênusîyeno. Çimkî nuştoxê zazakî zanî ke kurdkî=zazakî nîya. Labelê mûmkûn o ke sebebê ino têwgeyrayiş tene ino nêbo. Nuştox û hunermendê zazakî, psîkolojîyê bindestîya kurmancî de zî manenî. Yanî binêhîşê (Bîlinçaltı) xo de qebul kerdo ke kurdkî=kurmanckî dahîna meqbul o û kurdkî=zazakî çîyêko xerîb beno. Riyê ino psîkolojî ra zî hetê zazayan ra şuxulnayişê kurdkî=kurmanckî rê îtirazêko pîl nêvecîyeno.

**3) Xebata Zazakî De Kurmancî**

Ina babet ra ez cêr de qismê têwgeyrayişê zazayan de hewna behs kena la tîya de zî îcap keno ke ez çand çî vaca.

Ez ino çar ser ra vîşêr zazakî reyde meşxul bena. Ino wexto de mi eşkera fehm kerd ke, awa ke zazayî qiymet danî kurmancî û kurmancî ser şuxulîyenî, kurmancî wîna qiymet nêdanî zazakî. Eya, qursanê zazakî de merdim raştê kurmancan yeno. Qayilî bander bibî. Labelê elaqeyê kurmancan ina ra daşt nêşino. Ma vacî mi hema nêdîyo ke kesêk kurmanc, zazakî kitabêk nuşta yahût ma vacî xebata kitabêk zazakî de ca girewto. Eke estî zî, zaf zaf tay ê.La heto bîn ra hunermend û roşnvîrê zazakî, bi îstîqrar xebata kurmancî kerda yahût wîna xebatan de ca girewto. Wîna têwgeyrayişî zazayan baş o yan nebaş o, ez cêr de nûsena. Bê nuştişî zazakî, medya de zî qanalanê kurdan de zazakî yan ca nêgîna yan zî zaf taye ca gêna. Ma vacî Sterk Tv de 24 saet ra tene nîm saet zazakî weşane beno. Wîna numûneyan kê eşkenî bizêdnî.

**C-Hetê zazayan ra çand numûneyî**

**1)Zazakî Bêqiymet a**

Eya, zazakî bêqiymet a. Wendoxî tay î, nuştoxî tay î. Pekî çareserî çîya? Semedo ke wendoxî tay î û zazakî pere nêkena ma gerek vera xo tadî sewbina lehçeyan û ziwanan? Çîyo ke hunermend û nuştoxê zazakî kenî, nika wînî yo. Hunermendê ma yê tewr namdarî kurmancî û tirkî kitab nusenî, açarnayiş kenî, ferheng hedre kenî, deyiran vanî.

Eya yew tirk eşkeno wîna bikero yahût yew îngilîz. Çimkî ziwanê înan edî xelesîyayo. Labelê yew zaza senî nêweşî xo erd de verdeno û şino weşê şar reyde govend gêno? Ez zana ke sebebê ino psîkolojîk o. Labelê îcab keno ke zazayî xo ino psîkolojî ra bixelesnî û vera xo tam bi tadî zazakî. Ino bê îmkan nîyo. Ez ina babete ser numûneyêk bida şima: Seserra des û hîrê de Dante Qomedayaya Îlahî nuştî. Wexto ke Dante ina kitabi nuştî, Îtalya de pêro nuşteyî pê ziwanî Latînkî nusîyaynî. Labelê Dante ina kitabi latînkî ney, lehçeyêka floransa de nuştî. Kitaba ci ande serkewta bî ke ina lehçe zaf popûler bîyi û temelê îtalyankîya moderni vistî. Floransa zî bî merkezê Ronesansî. Yanî eke ewro îtalyankî ino hal de ya sebebê ci Dante yo. Ma semedê Îngilîzî zî eşkenî Şekspir numûde bidê. Inê wirdî merdimî zî karkerî ziwanî xo bîyî. Çîyo ke zazakî xelesneno zî "Karkerîya Ziwanî" ya. Yanî gerek hunermendê zazakî zafê mesaîya xo zazakî rê xerç bikerî.

Wîna hunermendî zazakî zî estî. Ez wazena şayî reyde behsê înan bikera: Kerem Sevînç, Rençber Ezîz, Mîkaîl Aslan ûsn. Inê merdimî pê zazakî xo ardo meydan û meyilê sewbina ziwanan nêkerdo.

Eke wînî nêbo, zazakî ko senî bixelesîya? Mûmkûn o ke wîna ma mîyane ra yew Şekspîr yahût Dante bivecîyo?

Ma xo xîr ra nêkî ke Mewlidê Ehmedê Xasî senî nusîyayo? Kesêk kurmanc vato zazakî tû çîyêko nuştekî çino û ina qala ci sebebê nuştişê Mewlidî bîya. Eke Mela Ehmedê Xasî zîhnîyetê hunermendanê ma nikayîn de bibînê, ko nuştişê zazakî yewna se sere bivindertinî!

**2) Ma Tembelî**

Raşte raşt, ma xebata xo de sist î, bêîstîqrar î û yew dest tewişenî. Gerek maddî gerek manewî ma xo tim tapa danî, gure ver nêdanî. Zafê merdimî ma mîyane de estî ke tene çeneyê înan şuxulîyeno. Rexne kenî, rayir kê nawnenî û hewna rexne kenî. Destê înan ra çî nîno, tene rijnayişî rê benî.

Tayê însanê ma zî goreyê xo, xo ver ro danî la hewna zî bes nêkenî. Ez numûne bida, mîsal Gruba Vate ino 24 sere est a. Ma pêro keyfê reyde behsê ci kenî û xo rê sey çilaya rayirî veynenî. Labelê heta ino yew sere ra ver Amed de cayê Vate çinê bi! (Çand sere ra ver cayêk estbi ofîs de, semedê bêîmkaneyî ra padîya!) Semedo ke cayê ci çinêbi, her humara ci 70-75 heb yan rotinî yan nêrotinî!

24 sere yew emir dima eke Vate nêeşkena cayêk abikera, ino eybê ma pêrino. Kam çi vano wa bivaco, gerek nika tewr taye di hîrê bajarê Kurdîstanî de cayê Vate bibînê. Ino xusus nîşanê sisteya ma yo. Tû xebate, xoverrodayiş yahût dexwa erdê homayî de çina ke sisteyi û pasîfeyi reyde amancê xo resaya.

Yewna kinarê ra ma biewnî mesela ra; Kovara Vate zî ino 23 sere esta ke vecîyena. Cî ko Amed de cayê ci abîyo her humara Vate nizdîyê 300 heb roşîyena. Gelo ina zî yew kemaneyi nîya? Zazayan mîyane de Vate çande yena şinasnayiş? Çêra tene beyntarê yew qismê zazayan de menda? Ina zî kemaneya ma nîya? Ma gerek ina sero zî bifikirîyê.

Kinarêk ra zî 24 sere ra dima Vate hema zî nêeşkaya ferhenga zazakî ya bitemamî hedre bikera. Hema zî nêeşkaya gramerê zazakî sero xebata dewlemend û pîli bikera. Ê ke eleqedarî zanî ke gramerê zazakî de hema zaf kemaneyî est î. Labelê ma kinarêk ra zî ewnîyenî se sere ra ver Celadet Bedîrxan tene 8-9 sere mîyane de gramerê kurmancî sero xebata xeylek dewlemend kerdo. Eke bikilmî ma vacî, Gruba Vate heqê ande seran hema nêeşkaya bida. Gerek ewro dahîna aver de bibînê.

Heme kes weş zano ke çi babet de beno wa bibo, serkewtiş, xebata bîîstîqrar û bidewom reyde mûmkûn a.

**D-Peyenî ser**

Ino nuşte de amancê mi kurmancî yahût kurmancan rê dişmenîye nîya. Qet wa wîna fehm nêbo. Şima zî veynenê ke zafê çî xelet virazîyeno û xelet dewom keno. Têkilîya zazakî û kurmancî zî xelet vîrazîyaya, xelet dewom kena. Ino xeletî de pare zazayan û kurmancan seyyewbinîyeya.

Ma pêro zanî ke zazakî nêweşa giran a. Çareserî zî belî ya. Ma gerek çar destan reyde zazakî binişê. Sey morcelayêk. Ancax wîna zazakî bixelesîya. La zafê hunermendê ma hema ina fehm nêkerda û derdê sewbina lehçeyan û ziwanan kewtî.

Wareyê Pîranî de vateyêk esto ke rewşa ma weş îfade keno, "Merre nêeşkeno şêro qula xo, gezi boça xo ra besteno!"

Bimanê weşî de.




Ge ge sernuşteyî merdimî, derheqê nuşteyê ci de fikirêk dano wendoxî. Ez vana qay zafê wendoxî sernuşteyî mi ra, derheq û muhtevaya nuşteyê mi de fikirêk bigirê. Wîna zî mûnasîp beno raşte raşt

# Rewşa tepişteya nêweşe Fatma Tokmak bena giran



Merkezê Xeberan

Roje çin a ke zîndanan ra xebera pinpaykerdişê heqê merdiman nêra. Rixmê raporê 'nêeşkena zîndan de bimana' yê Weqfa Heqanê Merdiman ya Tirkîya tepişteya nêweşe Fatma Tokmak nêna veradayene. Rewşa weşîye ya Fatma Tokmaka ke Zîndanê Bakirkoyî de tepişîyena bena giranêr.

Avûkate Jîyan Tosuna ke Fatma Tokmak zîyaret kerd derheqê babete de qisey kerd. Tosune vist vîrî ke Fatma Tokmak de nêweşîya qelbî esta, bedenê ci masayo û çipik û pîzeyê aye bîyî mor. Tosune vat ke qelbê Tokmake bi nîzamî nêlerzeno û tim hîşê ci sereyê aye ra şino.

Tosune ard ziwan ke karantîna ra Tokmake nêwazena şora nêweşxane û pare kerd ke verî Nêweşxaneyê Sadî Konukî yê Bakirkoyî de hewte de yew goniya ci vurîyayêne la doktorî hînî mengêke de yew û revîrê zîndanî de goniya ci vurnenê.

Hemsereka Pêroyî ya Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD) Eren Keskîna ke hem avûkat hem zî wasîya Tokmake ya eşkera kerd ke pêvînayîşê ci yê bi muwekîla xo yenê astengkerdene. Keskîne da zanayene ke destpêkî ra nata muwekîla ci rê bêhuqûqî yena kerdene.

Keskîne vist vîrî ke Tokmake serra 1996î de domanê xo yê 2 serreyî Azadî reyde amebî destbendkerdene, maruzê îşkenceyê giranî bîye, verê çimanê aye de bedenê lajê ci de cixare ame hewnakerdene, rixmo ke tirkî nêzanayêne bi zorî pê aye îfade ame îmzakerdene. Keskîne eşkera kerd ke Tokmake rixmo ke bêsûc a cezaya muebede dîyaye ci.

Keskîn pê hesna ke rixmê nêweşîya girane û raporê Weqfa Heqanê Merdiman a Tirkîya Fatma Tokmak nêameye veradayene. Keskîne pare kerd ke weşîya Tokmake ser o rîskêko pîl esto û ganî cade bêra veradayene.






Kewê Redkan

# Ez kor im

Serê biharê ye, kelekela heywanan e lê kelekela me ciwanan e jî. Mal hêdî hêdî barê xwe didin hev û derdikevin zozanan. Ew çi eşqek, kelecanek mezin bû; min çiqas hez dikir ez her tim li zozanan bijîm. Tu li wan zozanan bêdawî azad î. Azadiya li wan zozanan li tu derê tune ye. Li wan zozanan, serê biharê hemû der hêşnahî ye; bêhna gul û sosinan, bêhna aşotî yê. Tu dibêjî qey, di nav bihuşteke din de dijî. Bi rastî jî wisa bû. Dîsa ewila biharê malên barê xwe danîn ser pişta ker û hespan û berê xwe dan wan zozanên li ber pala çiyayan. Konê xwe vegirtin, koza berx û golikan çêkirin, stêrên nivînan qat bi qat di bin konî de hiljenîn, li ber konê reş agirekî gur pêxistin, xwarineke xweş û çayeke bejî çêkirin; de were di nav vê bihuştê de nejî, qet dibe!

Rojekê ez û qîza cînara me Cemê, em çûn ser 'Kaniya Ziyaretê'. Ew kanî di nav daran de bû, ava wê şîrîn û xweş bû. Ew roj pir germ bû. Ez û hevala xwe çûn ser kaniyê, ew dem kesek li wan der û dora nîne. Me dikarîbû bi dilekî rehet em bikevin gola li ber kaniyê. Cemê got, ez ê derkevim ser vê darê, ka binêrim li der û doran şivan û gavan hene an na? Wê mêze kir li nêzîk kesek tune ye. Me xwe tazî kir û em ketin golê. Bi vir de û wê de Cemê got, diya min li benda avê ye, ez ê herim malê dîsa vegerim û bêm cem te. Cemê vêdrokên xwe tijî av kir û berê xwe da malê lê dema ew çû dîsa tirsek kete nav dilê min, hema min xwest ez bi tena serê xwe di nav wê avê de zêde nesekinim û derketim. Li nêzîk dengek, wek tiştek bike xişînî hat ber guhê min. Min wisa li der û dora xwe nihêrt. Wîîî, kurê Şefîqê xwe ji ser darê avête erdê. Ez hinekî tirsiyam lê dîsa jî ew li van deran çi digere? Wî got, netirse ez kor im, çavê min nabînin. Min bi ser de kir qêrinî, bi paşila stûyê wî girt û bi lez çûm ba diya wî. Min got, waye hal û meseleya kurê te ev e. Vê carê dengê xwe nakim lê careke din ez ê dev û diranên wî bişikînim. Hema çi hate ber devê min, min got. Gede li min vegeriya û gote min, tu xwişka min î... De here kotiyê heram, ez çima xwişka te me? Me şerekî mezin kir. Piştî çend mehan şûn de dîsa rojekê ji ser darê dikeve û her du çavên wî jî kor dibin. Ew jî nizane wê kengî çavên wî vebin!

# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine.
Em bi hêvî ne ku li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van mamikan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin.

Bêguman tiştanok bi gotina 'mamê mino mamanî' an jî bi 'kî dizane ev çi ye?' dest pê dike.

**1-** Mamê mino mamanî
Bê ling û bê pehnî
Ji xwe de diçe ser banî

**2-** Mamê mino mamanî
Dest û tilî çermanî
Xwe hildavêje zirçanî

**3-** Mamê mino mamanî
Hespê boz
Kire toz

**Bersivên me ev in:**
**1-Dû, dûman, dixan**
**2-Beq**
**3-Aş**

# Zûgotinok

Hefteyek din derbas bû. Ez bawer im we bêriya me kiribû. Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par ve bikin.

De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li ser hev bêje:
**Çend cildirûn ji vir de çûn**
**Çend cildirûn jî ji wir de hatin**
**Van çend cildirûnan ji wan çend cildirûnan re got**
**Hey cildirûno**
**Hûn çi çend cildirûn in?**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Dano dan da conî, mirkut gum da conî**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev bibe:
**Dar kir kayê da dest dayê**



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**


1. Saet 3. Bajarekî bakurê Kurdistanê 5. Heywanekî avî ku goştê wî tê xwarin 6. Bistanê zebeş û petêxan
7. 12 meh 9. Xelkê Afxanistanê 12. Koma girêdayî ya giya yan jî koma nîskan
14. Yan, du yan zêdetir alternatîfan diyar dike
15. Qewmekî kevnar ku wekî pêşiyên kurdan tê nasîn
17. Awayê tewandî yê cînavka şanîdanê ya ji bo kesê nêzîk
18. Noteke mûzîkê 22. Folklor, çand û wêjeya gel a kevnar

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Teyrikek an jî firindeyeke ku pê nêçîr tê kirin 2. Dîrok
3. Sewaleke kedî ku ji goşt, hirî û şîrê wê sûd tê wergirtin 4. Hevser
5. Kesên malê, endamên malê
7. Zaravayekî kurdî
8. Mels, hêlîn, lûs
10. Hîle û xap
11. Zarokê zarokên mirov
13. Sala em tê de ne
14. Pîşeyekî kevin, qeraşî, kesê ku li aş kar dike 16. Şekil, şêwe
19. Sembola welatan
20. Pelg, belg, şaxên daran dixemilînin
21. Agir
23. Mil, endamekî laşê mirov

Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 B | E | 2 Q | | | | | | 3 S | I | 4 R | |
| A | | E | | | 5 C | Ê | W | Î | | E | |
| 6 R | O | M | A | | I | | | | | | |
| | | E | | | R | | 7 F | E | 8 R | | |
| 9 B | 10 U | R | Y | 11 A | N | | I | | O | | |
| | S | | | D | | | 12 R | O | J | 13 Î | |
| 14 T | A | | | A | | | I | | | C | |
| Î | | | 15 U | R | 16 M | I | Y | E | | A | |
| 17 G | A | | | | E | | A | | | 18 D | 19 A |
| R | | | 20 B | | R | | | 21 S | | | V |
| Î | | 22 B | E | Ş | D | 23 A | R | Î | | | Î |
| S | | | R | | | X | | | | | |




## Pirtûka 'Zimanê Me' ji weşanên Loryayê derket

Pirtûka 'Zimanê Me' ya Mustafa Acar ji weşanxaneya Loryayê derket. Pirtûk ji 78 rûpel û 3 beş e. Beşa pêşî çend helbestên li ser zimanê kurdî ne; ya duyemîn li ser çandê hin çarîn in; beşa sêyemîn jî ji bo ku zarok ji ajalan hez bikin, li ser hin ajalan helbest û hin mijarên cuda ne. Hemû mijar li gor teşeyên qafiye û nezmê hatine nivîsandin. Di beşa ewil de helbesta tîpan bi awayê marşê hatiye amadekirin. Ji bo her tîpekê çarînek heye.

Nivîskar Acar dibêje ku pirtûk tenê ne ji bo zarokan e. Dema mezin ji zarokan re bixwînin dê hem kêfa mezinan hem jî kêfa zarokan jê re were. Dema kal û pîr guhdarî bikin dê bi kêf lê guhdarî bikin, ji ber ku behsa amûr û tiştên ku ji zemanê berê tê de hene. Mirovên li gundan mezin bûne dê zaroktiya xwe tê de bibînin. Dema ciwan bixwînin dê bi saya wê haya wan ji xweşbûna kurdî çêbibe. Loma jî nivîskar Acar dibêje: "Dema me wê da nasîn me got em dixwazim ev pirtûk di malên temamê kurdan de hebe û ji heft saliyan heta heftê saliyan bixwînin. Yên dizanin bixwînin, divê ji yên nizanin bixwînin re bixwînin."

**Mustafa Acar kî ye?**

Li medreseyan xwendiye; li Amedê heşt salan meletiya fermî û salekê jî mamostetiya çanda olê kiriye. Niha li zanîngeha Yuzuncu Yilê ya Wanê lêkolîner e.

Xebatên wî bi piranî li ser ilmên îslamî ne ku bi kurdî hatine nivîsandin. Ji bilî vê pirtûkê niha çar dosyeyên wî yên helbestan bi kurdî ji bo çapê amade ne. Dosyayek ji bo ciwanan, yek ji bo welatperweran, yek jê jî mijarên curbicur in. *AMED*

# Çîroka mamostetiya Bawer Agirî

Evîn Hesen

Bawer Agirî vê biharê li Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê mamostetî kir. Ji bilî van, hinek sertîfîkayên grafîk û sêwirandina malperan û geşedana kesanî standine. Heta niha gelek nivîs û helbestên wî di gelek malper û rojnameyan da hatine belavkirin. Niha jî ew di YouTubeyê de, di kanala Hîngeha Kurdî de vîdyoyên dersên kurdî çêdike.

Agirî der barê xebatên xwe yên dersên kurdî yên li ser Youtubyê de wiha dibêje: "Wekî tê zanîn kurd li du parçeyan ji perwerdeya kurdî bêpar in. Dema mirov li vê rewşê dinêre, bivê nevê mirov xwe berpirsiyar dibîne ji bo bi karekî wiha rabe. Sedemek din jî ew bû ku dema ez şagirt bûm, li ser torên civakî dersên kurdî tune bûn. Min wê demê di mijara çavkaniyan de gelekî zehmetî dikişand. Ji ber vê yekê ez niha dersên kurdî wekî vîdyo çêdikim û li YouTubeyê bar dikim."

**Dema mirov li vê rewşê dinêre, bivê nevê mirov xwe berpirsyar dibîne ji bo bi karekî wiha rabe. Sedemeke din jî ew bû ku dema ez şagirt bûm, li ser torên civakî dersên kurdî tune bûn**

**Dibe arşîv**

Agirî di berdewamiya axaftina xwe de xebatên xwe wiha dide nasîn û dibêje: "Mirov dikare vê wekî arşîveke berdest a ji her kesî re vekirîye bibîne. Ev yek jî ji bo min dibe moral û kêfxweşî. Divê ez vê yekê bibêjim ku zimanê ji aliyê bi milyonan kesan ve tê axaftin bi dersên wiha nayê parastin. Divê demek berî demekê, zimanê kurdî li hemû Kurdistanê bibe zimanê perwerdeyê. Ev daxwaza me hemû kurdan e."

**Bangek ji bo mamosteyan**

Agrî der barê erkên dikevin ser me mamsteyên kurd jî wiha dibêje: "Bi taybetî mamosteyên kurd divê vê yekê ji xwe re wekî erk bibînin, zend û bendên xwe badin wekî min vîdyoyên dersên kurdî çêbikin. Da ku kurd jê feydeyê bistînin û xelk nebêje 'ji xwe re karekî nakin'."

**Rewş û zehmetiyên dersdanê**

Der barê rewşa heyî ya perwerdeyê û zehmetiyên di vê xebatê de, mamote Agirî vê rewşê wiha dinirxîne û dibêje: "Niha şopînerên min ji du hezar kesan zêdetir in. Mixabin ji ber ku ez bi kurdî dersên kurdî didim, kesên ku nû dest bi xwendin û nivîsîna kurdî kirine yan jî dixwazin hînî xwendin û nivîsîna kurdî bibin, zêde ji min fêm nakin. Ji ber ku ez hin têgihên rêzimanê û peyvên ew nizanin bi kar tînim, ew jê fêm nakin. Ez jî mecbûr dimînin di her dersê de wateya hin peyvan bi tirkî dibêjim. Ev jî ji bo mirov dibe bargiranî. Ji bilî vê yekê vîdyo dirêj dibin û şopîner heta dawiyê ji bo temaşekirinê sebir nakin."

**Ders çawa tên amadekirin**

Mamoste Agirî der barê plansaziya xwe ya amadekirina vê xebatê jî wiha derbirî û tîne ziman: "Ji bo dersdayînê plansazî nebe nabe. Ji ber vê yekê min pêşiya pêşîn ji xwe re plansazîyek çêkir. Ji bo destpêkê ez dersên pêwîst çêdikim. Her carê li gorî pêdiviyê mijarekê pêşkêş dikim. Ez li gorî standardên navneteweyî dersan didim. Hûn rêzepirtûkên Hînkerê dizanin. Ew li gorî standardekê hatine amadekirin. Ez jî li gorî pedagojî û hêsanhînbûna mirovan dersan amade dikim."


**Banga ji bo şopdaran**

Bawer Agirî ji bo şopdarên xwe jî vê şîretê dike û didomîne: "Niha tiştê ku divê ez bibêjim, pêwîst e şopînerên min ferhengan bistînin û xwe hînî peyvên ew nizanin bikin. Niha li gel ferhengên destî, ferhengên telefonan jî hene. Mirov dikare wan daxe telefona xwe û bi hêsanî bi kar bîne. Ji bilî vê yekê ji bo mirov zûtir xwendin û nivîsîna xwe bi pêş bixe, divê mirov pirtûkan bixwîne, rojane bi kurdî biaxive û bi kurdî binivîse".

**Bawer Agirî kî ye?**

Di sala 1984'an da li bajarê Agirîyê, navçeya Avkevirê, gundê Geldûşê hatiye dinyayê. Di sala 2014'an da tev li kursên zimanê kurdî yên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê dibe. Bi awayekî serkeftî di 2019'an de bawernameya xwe ya mamostetiyê distîne.

Bernameya computerê word û bernameyên adobeyê, photoshop û illustratorê bi kar tîne. Di sala 2016'an de pirtûkeke helbestan a bi navê 'Êş' ji alî weşanên Nayê ve hatiye çapkirin.






## Pirtûka 'Mam Celal: Komkirina hevdijan' hat belavkirin

Pirtûka 'Mam Celal: Komkirina hevdijan' li bajarê Silêmaniyê bi merasîmekê hate danasîn û belavkirin.

Pirtûk li muzexaneya Emnesorekeyê ya Niştimanî ya bajarê Silêmaniyê, bi tevlêbûna gelek berpirsên hikûmetê, malbatên pakrewanên Enfalan, rewşenbîr û mamosteyan hat belavkirin.

Ew pirtûka ji aliyê mamoste Herêm Ebdula ve hatiye amadekirin, lêçûna wê ya çapê jî ji aliyê berpirsê yekîneyên 104'an Îsmaîl Hemîd ve hatiye dayîn.

Ji bo wefadariya ji ruhê pakrewanên rêya azadiyê re, wekî sembola 21 tîrêjên rojê ya Alaya Kurdistanê 21 kesan belavkirina pirtûkê girte ser milê xwe û dest bi belavkirina vê berhemê kirin. *SILEMANÎ*

## Komîna Avrînê amadekariya kurtefîlma "Pîjek" dike


Komîna Sînemayê ya Avrînê xebata li ser kurtefîlma bi navê "Pîjek" li kantona Şehbayê didomîne. Kurtefîlm behsa şehîd û qurbaniyên wan dike ku di oxira parastina welat û axê de canê xwe jî dest dane.

Piştî bidawîbûna çalakiyên mîhrîcana Lêlon a Sînamaya Navneteweyî, Komîna Sînemayê ya Avrînê li ser kurtefîlmekê dixebite. Kurtefîlm behsa çîroka dayikekê dike ku kurê wê şehîd bûye. Dayik bi ku ve diçe kurê wê li pêş çavên wê ye û hêviya vegera wî dike.


Kurtefîlm ji berhem û derhêneriya endamê rêveber ê Komîna Avrînê, Cangîn Ebdo ye. Dirêjahiya fîlm 10 deqîqe ye. Li Goristana Şehîdên Berxwedana Serdemê ya navçeya Ehresê û gundê Um Hoş ê kantona Kobanê hatiye kişandin û niha di merheleya dawî ya çêkirinê de ye.

Di kurtefîlmê de 4 lîstikvan hene; yek dayik û zarokên wê û kurê wê yê şehîd Cîger e. Tê gotin ku kurtefîlm wê li kampên koçberên Efrînê û di mîhrîcanên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de jî were pêşandan.

Girêdayî mijarê, endamên rêveber ên Komîna Sînemayê ya Avrînê û derhênrê kurtefîlmê "Pîjek" Cangîn Ebdo wiha got: "Armanca me ji vê kurtefîlmê ew e ku şehîd nemir e. Tê de behsa çîroka dayikekê dike ku kurê wê şehîd bûye û bi ku ve diçe li pêş çavên wê xeyalên wî çêdibin. Bi demê re dayik nikare kurê xwe ji bîr bike. Kurtefîlm balê dikişîne ser rola şehîd û qurbaniyên di oxira parastina welat de têkoşiyane."




Ebdo da zanîn ku komîn dê di rojên pêş de li ser fîlmeke nû yê bi navê "Peyama Dawî" bixebite. Ev fîlm li ser berxwedana şervanên li eniyên pêş e. *HELEB*




## Hejmara duyemîn a 'Temaşe'yê derket

Hejmara duyemîn a kovara Temaşeyê derket. Kovar bi awayekî online derdikeve û bi giştî sînemayê, bi taybetî jî der barê sînemaya kurdî de nivîs û agahiyan parve dike.

Kovara Temaşeyê kovareke demsalî ye û her sê mehan carekê derdikeve. Di kovarê de çend gotarên der barê sînemayê bi zaravayê soranî jî cih digirin.

Di hejmara duyemîn a kovarê de hevpeyvînek der barê 10'emîn Festîvala Fîlmên Kurdî ya Berlînê de heye. Her wiha gotarek li ser sînemaya Yilmaz Guney bi sernavê 'Di Sînemaya Yilmaz Guney û Jean-Luc Godard De Mijara Netewperweriyê' cih digire. Nivîsek din jî bi sernavê 'Sînemaya Neteweke Bêdewlet' di vê hejmarê de heye û her wiha gelek mijarên din ên têkildarî sînemayê bi hezkiriyên sînema û xwînerên xwe re parve dike. *AMED*

xwebûn

9-15 Mijdar 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 47

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazışleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:0 (541) 806 84 85**



Ardîn Dîren

DOSYA

Qewmê li pey azadî, nasname û zimanê xwe; amazîgh ango berberî - 4

Ben Bella, Hocine Aid Ahmed û Muhammed Budiaf çend amazîghên ji pêşengên şoreşê bûn. Beriya razgariya neteweyî pêk were, her tim gotina “Em birayê hev in” di meriyetê de bû lê çi xerîb e piştî rizgariya neteweyî “biratî” tê jibîrkirin

# Hevaltiya amazîghan tê jibîrkirin

Li Cezayîrê beriya rizgarî pêk were amazîgh û ereb bi hev re di eniyekê de li hember Fransayê şerekî bêhempa bi rê ve dibin. Di navbera pêşengên FLN’ê de gelek amazîgh jî hene. Kesên weke Ben Bella, Hocine Aid Ahmed û Muhammed Budiaf çend amazîghên ji pêşengên şoreşê bûn.

Beriya razgariya neteweyî pêk were, her tim gotina “Em birayê hev in” di meriyetê de bû lê çi xerîb e piştî rizgariya neteweyî “biratî” tê jibîrkirin! Li hember amazîghan ango berberiyan roj bi roj helwestek tê nîşandan li Cezayîrê û hebûna wan napejirînin. Kesên dibin xwedî hêz paşeroj û bîranînên xwe yên bi amazîghan re zû ji bîr dikin. Dixwazin her tiştî li gor xwestekên netewe-dewletê saz bikin. Ew jî pir baş dizanibûn ku ev kirasê jakobenîzmê li bejna Cezayîrê nedihat lê “Fransiyên Herêmî” di vê de israr kirin. Bi vî awayî hemû daxwazên demokratîk binpê kirin û li gor daxwazên FLN’ê komarek damezirandin. Tu cudahiya wê ji dîktatoriyê tune bû mixabin. Navê hin pêşengên FLN’ê yên dijberî wan ji dîroka şerê neteweyî derxistin. Ew yek bi yek tasfiye kirin û xwestin navê wan bidin jibîrkirin. Şerê rizgariya neteweyî cara pêşî li bajarên amazîghan dest pê kiribû lê xwestin vê rastiyê jî biguherînin. Ji bo berjewendiyên xwe dîrokeke çewt û derew bi nifşên nû dan hînkirin.

**‘Em ereb in, ereb, ereb!’**

Hê di sala 1962’yan de Ben Bella ku êdî serokomar e, hevalên xwe yên amazîgh ji bîr kiribûn û wiha digot: “Em ereb in, ereb, ereb!” Piştî demekê di sala 1964’an de Humeyrî Bumedyen, bi darbeyeke leşkerî Ben Bella jî ji cihê wî dike û dîktatorî dest pê dike. Burokrasiyeke pûç dibe xwedî desthilat û heya îro jî li Cezayîrê ev burokrasî serdest e.



Ji bo wan rojan Şehmus Guzel di pirtûka xwe ya bi navê “Cezayîr û Berberî” de wiha dibêje: “Bi hinceta yekitiya neteweyî hunermendên berberî ji radyoyên Cezayîrê hatin dûrxistin û stranên berberiyan hatin qedexekirin. Hunermendên fermî û yên biyanî bi eyarê stranên berberiyan lîstin, naveroka wan pûç kirin û li gor xwe bi şêwazeke nû şîrove kirin. Pirtûkên dîrokê, dîroka Cezayîrê bi hatina ereban dan destpêkirin. Li gor van pirtûkên dîrokê yên nû beriya ereban tu kes li ser axa Cezayîrê tunebû! Hebûna berberiyan ya bi hezaran salan, çand û dîroka wan tune hesibandin lê ji ber ev pirtûk wiha nivîsandin qey rastî dikare bê guhertin! Li hember vê înkar û tunekirinê li bendemayîna ku berberî xwe, ziman û çanda xwe ji bîr bikin çiqas rast e gelo? Li aliyekî din bi hezaran berhem, stran, destan, çîrok û çand û şaristaniyeke qedîm hebû… wê ev çawa bihatana jibîrkirin? Dê berberî li hemberî van polîtîkayên dijwar çawa bêdeng bimana?”

**Helbesta Kevin a Qebîliyan**

Ji ber van sedeman amazîgh bêdeng neman û zilma li ser çand û zimanê xwe tu carî nepejirandin. Dengê xwe bilind kirin û xwe birêxistin kirin. Di pêvajoya serdestiya FLN’ê de gelek çalakî tên lidarxistin lê çalakiya sala 1980’yan ji bo berberiyan taybet e.

Serhildan û biharên li ser axa ereban navdar in bêguman, ji lewma ev bûyer jî di dîroka berberiyan de wek “Bihara 1980’yî” cihê xwe digire. Bûyer wiha diqewime; di nîsana 1980’yan de Mouloud Muammerî, li bajarê Tizi Ouzouyê (bajarekî berberiyan e) bi navê Helbesta Kevin a Qebîliyan dixwaze konferansek li dar bixe lê ev konferans tê qedexekirin. Li ser vê qedexekirinê xwepêşandan çêdibin, di dawiyê de gelek kes tên kuştin, hin kes birîndar dibin û hin kes jî tên girtin. Piştî vê bûyerê êdî berberî li hember FLN’ê û komara Cezayîrê bêtir xwe birêxistin dikin û têkoşîna wan a çand û ziman wiha dest pê dike. Li hember nêrîna “neteweya ereb û misilman” helwest nîşan didin û ew vê nêrînê îro jî napejirînin.

Piştî ku di sala 1990’î de li Cezayîrê rê li ber avakirina sazî û partiyên nû vebû, amazîgh çend rêxistinên siyasî û çandî damezirandin. Bi rêya van partî û komaleyan li ziman, nasname û çanda xwe xwedî derketin û îro jî derdikevin.

Hocine Aid Ahmed ê yek ji pêşengên berberiyan e di sala 1989’an de dawî li jiyana xwe ya mişextiyê tîne û vedigere welatê xwe. Ji ber dijberiya FLN’ê ew bi salan e li derveyî welat dima lê piştî rê li ber partiyên nû yên siyasî vedibe ew jî biryar dide ku têkoşîna xwe li welatê xwe bidomîne û bi vê armancê partiya FFS’ê (Eniya Hêzên Sosyalîst) ava dike. Piştî vegerê û damezirandina partiyê li seranserê welat digere û bajarên qibeylîyan bi rêxistin dike. Qibeylî (berberiyên Cezayîrê wek qibeylî jî tên binavkirin) ji ber rol û mîsyona wî ya salan ji Hocine Aid Ahmed hez dikirin û li dora partiya wî kom bûn lê qibeyliyên xwe nêzî vê partiyê nedidîtin jî hebûn û ew jî li dor partiyên cudatir kom bûn.

Beşek ji berberiyan MCD’ê (Tevgera Çanda Berberî) ava dikin lê hin nivîskar û muzîkjenên nêzî MCD’ê, RCD’ê (Yekitiya Çand û Demokrasiyê) ava dikin. Her çiqas di navbera van partiyan de di hêla bîrdoziyê de cudahî hebin jî ev partî ji bo mafên qibeyliyan têdikoşin. Li hember ramana “Cezayîr ereb e û baweriya wê jî dînê îslamê ye” bertek nîşan didin û dixwazin çand û zimanên din jî di fermiyetê de werin naskirin.

Di navbera salên 1990 û 2000’î de li Cezayîrê kuştin pir çêdibin. Kesên bi îslamê bawer in û dixwazin Cezayîrê li gor dînê îslamê bi rê ve bibin, qibeyliyan zêde laîk dibînin û êrîşê wan dikin. Di navbera partiyên îslamî û qibeyliyan de gelek bûyer diqewimin. Berberî gelek caran hilbijartinan boykot dikin û naçin ser sindoqan. RCD û MCD federalîzm dixwestin lê FFS bêtir di nav sînorê Cezayîrê de avakirina demokrasiyê dixwest û veqetandina qibeyliyan a ji Cezayîrê erê nedikir. Ji ber van nêrînên siyasî dem bi dem di navbera wan de jî nîqaş çêbûne lê gava mijar dibe berberî û mafê wan hemû dibin yek.

**Komîteyên ewlehiyê ava dikin**

Di 1994’an de êrîşên li ser qibeyliyan dijwartir dibin. Li ser vê yekê RCD biryara ku şerê çekdarî bikin didin û nahêlin ereb derbasî herêmên wan bibin. Li gundan “Komîteyên Ewlehiyê” û “Şandeyên Rûsipîyan” ava dikin û xwe ji êrîşên partiyên nepen ên îslamî diparêzin. Di encama xwepêşandanan de çend pêşengên RCD û MCD’ê tên girtin. Serokê MCD’ê Ozan Ferhat, serokê RCD’ê Saîd Saîdî û Nouredddîne Ait Hamouda, mûzîkjenê navdar Matub Lunes û gelek kesên din digirin davêjin hepsê. Di girtîgehê de gelek îşkence jî dikin li van kesan. Qibeylî jî ji bo dengê wan li dinyayê were bihîstin û ev îşkence werin dîtin paşde gav navêjin berovajiyê vê yekê helbest û stranên kesên hatine girtin bi hev re dibêjin û çalakiyên xwe xurttir dikin. Heya ev kes ji girtîgehê derdikevin dev ji protestoyan bernadin. Di dîroka Cezayîrê de protestoyên qibeyliyan navdar in û hema bêje ji xeynî qibeyliyan kes li hember neheqî û çewtiyên komara Cezayîrê dengê xwe bilind nake.

**Doza serxwebûnê dikin**

Tevî ku zimanê qibeyliyan tamazîght di sala 2016’an de di fermiyetê de hatiye pejirandin jî wan dîsa dev ji çalakiyên xwe bernedane û îro doza serxwebûnê dikin. Li çand û zimanê xwe xwedî derdikevin û dixwazin bajarên xwe ew bi rê ve bibin. Naxwazin ji navenda Cezayîrê destûran bigirin û xwe li gor nêrîna netewe-dewletê saz bikin. Dixwazin li herêmên xwe azad û bi aborî û mafên xwe yên însanî wekhev bijîn. Ji bo ev yek pêk werin her roja înê çalakiyên xwe yên ku êdî bûne kevneşopî li dar dixin û dimeşin.

**Matub Lunes: Li dû azadiyê**

Beriya Matub Lunes, dewleta Cezayîrê êrîşê mûzîkjen û nivîskaran dikir. Mûzîka RAI ku li Cezayîrê xwedî rihekî azadiyê bû û dijberî hişmendiya dewletê û îslamê bû her tim di bin êrîşên hêzên nepen ên îslamî de bû. Wan bi çavekî heram ku mirovan ji rê derdixe li muzîka RAI dinêrî. Cheb Hasnî yek ji wan kesan bû ku wek avakarê muzîka RAI dihat naskirin. Bi hezaran ciwan diçûn konserên wî. Dewleta Cezayîrê û hêzên îslamî her tim gef lê dixwarin û ew tehdît dikirin lê Hasnî jî li hember van kesan wêrek tevdigeriya û wiha digot: “Ez ji wan natirsim û ez ê welatê xwe neterikînim.” Hasnî dixwest hin tabûyên Cezayîrê bişikîne û ji bo vê yekê bi muzîkê re mijûl dibû lê ew hêzên nepen di sala 1994’an li ber mala wî êrîşê Cheb Hasnî kirin û ew kuştin. Di dîroka Cezayîrê de bûyerên bi vî rengî gelek in lê bûyera herî tê zanîn ya Matub Lunes e.





(Slim. Humanité. 28-29 juin 1998)

Çavsorî, tirs û zikreşiya desthilatdaran a li dijî hunermendan di jiyana Lunes de veşartî ye. Lunes, hunermendekî li dû azadiyê bû û kesên jê hez nedikirin dixwestin wî bifetisînin da ku dengê wî neyê bihîstin. Lunes aktîvîst û muzîkjenekî şoreşger bû. Bi hevalên xwe yên weke Idır, Hozan Ferhat û Ait Menguellet MCB’ê(Tevgera Çanda Berberiyan) ava kiribû. Ew hêj di ciwaniya xwe de ji bo doza ziman û nasnameya xwe dest bi milîtaniyê dike. Di hemû stranên xwe de vê yekê aşkera û bêtir vedigot. Wî bi zimanê qibeylî digot. Ji ber vê helwesta xwe televîzyon û radyoyên Cazayîrê tu carî wî qebûl nakin. Di protestoyên qibeyliyan de ew her tim bi stran û gîtara xwe li pêş bû. Piştî demekê ji ber gefên leşkerên Cezayîrê mecbûr dimîne diçe Fransayê lê sebra wî li wir nayê û dîsa vedigere welatê xwe. Di serhildanên sala 1988’an de polîs gule lê dibarînin. Her kes dibêje jixwe miriye û ew davêjin nav miriyan lê Lunes namire. Piştî 17 operasyonên emeliyatê ew dîsa baş dibe û radibe ser piyan. Vê carê jî hêzên îslamî yên çekdar (GIA) jê nagerin, di 1994’an de wî direvînin û bi rojan lê îşkenceyê dikin. Piştî protestoyên qibeyliyan mecbûr dimînin wî serbest berdin.

Piştî çend salên din dibînin ku Lunes ji ya xwe nayê xwarê û stranên xwe yên ji guleyên wan xurttir dibêje û direşîne ser pergala Cezayîrê û wan protesto dike. Rêxistina îslamî ya GIA di 1988’an de dîsa wî direvîne û wî dikuje. Piştî mirina Lunes bi hezaran qibeylî li bajarên Tizi Ouzouyê grevê îlan dikin û dadgehê protesto dikin. Dengê Lunes bêtir belav dibe li Cezayîrê û her wiha li dinyayê. Doza wî bêtir tê nasîn. Lunes bi wêrekî û afirîneriya xwe dihat nasîn, ew li dû azadî û rastiyê bû. Li hember kesên dixwestin wî asîmile bikin û dengê wî qut bikin wiha digot: “Welatên hemû gelên bindest welatên min in. Ez ne ereb im, ez berberî me.”

Bi gotina Lunes, berberî ne ereb û ne jî misliman in. Ew qewmek e, di bin simên mêtingeriyê de hatiye perçiqandin lê li gel ewqas perçiqandin, bişaftin, kuştin û êrîşan dîsa jî ew li dû nasname, azadî û zimanê xwe ne. Ew bi stran û rengê xwe îro xwedî çandeke qedîm û xweser in li Cezayîrê. Dilê wan ji bo azadiyê lêdide, serhildêr in û ji bo civaka xwe serxwebûnê dixwazin. (Dawî)

***Çavkanî:***

***•Şehmus Gazel/Cezayîr û Berberî/Weşanên Doruk***

***•Mohammed Chtatou/Niştecihên Herî Kevn yên Bakûrê Afrîkayê/Malpera Perspektif***

***•Wîkîpedîa***

## Hêza hunerê û tirsa desthilatdaran

Li hemû welatan balkêş e, kesên desthilatdar pêşî êrîşî çand, ziman û mûzîkjenên wan dikin. Ev yek ne tiştekî ji rêzê ye, ji lewre civak bi saya vana rabirdûya xwe bi bîr tîne û dahatûya xwe saz dike. Desthilatdar naxwazin zû bi zû dengê mezlûman were bihîstin û êrîşî dengê wan dike û dixwaze wan bêdeng bike lê hin deng hene ku tu desthilatdar nikarin wan tune bikin. Ew deng ji dagirker û wehşeta wan mezintir in. Li Şîliyê dengê Victor Jara, ji hêza Pînochet bilindtir bû lewma xwestin wî bikujin; li Kurdistanê dengê Hozan Serhat di ser artêşa Tirkiyeyê re bû lewma wî kuştin; li Cezayîrê jî dengê Matub Lunes dengê qibeyliyan bû yê baweriyê dida, ji lewre ew girtin, îşkence kirin û herî dawî jî kuştin.